# Hawar

Rojnameya Rojane
20 Gulan 2009
Çarşem
Sal: 1
Hejmar: 15
Buha: 50 Kr


## Mîhrîcan bi vekirina atolyeyan dest pê kir

Mîhrîcana Amedê her sal weke kevneşopiyekê tê lidarxistin. Îsal 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê bi xebatên atolyeyên çand û hunerê dest pê kir. Atolyeyên hunerê dê ji aliyê hunermend û akademîsyenên ku di beşên xwe de pispor in ve bên dayîn. Îsal atolyeyên wekî; govend, def, peykersazî, wênesazî, şano û sînemayê hatine vekirin. Atolyeyên hatine vekirin ji aliyê gel ve rastî eleqeyeke mezin tên... RÛPEL - 6

## GHOBADÎ REWŞA XWE YA DAWÎ VEGOT:
# Nikarim vegerim Îranê



**Derhênerê kurd Bahman Ghobadî ji ber ku di fîlmê xwe de rejîma Îranê rexne dike nikare vegere Îranê û eger vegere jî ji bo kişandina fîlman destûr ji wî re nayê dayîn. Ghobadî got ku li hemberî vê yekê xemgîn e**

Bahman Ghobadî destnîşan kir ku li Îranê kesên muxalîf rastî astengî û zehmetiyan tên û mafên mirovan tên binpêkirin û wiha got: "Li Îranê îro ew qas pirsgirêk hene ku dema mirov ku dinêre rastî pisgirêkan tê. Bi taybetî jî binpêkirinên mafên mirovan gelek in. Bi hezaran ciwan di girtîgehan de ne. Kesek nikare bi rehetî karê xwe yê hunerî bimeşîne. Gelek muzîkjen derhêner hene berhemên wan bi riyên korsan tên firotin. Li Îranê mirov tenê ji bo stranekê jî rastî cezayên bi salan tên."... RÛPEL - 6

# Pêkanînên dermirovahî

Li girtîgehên Tirkiyeyê pêkanînên faşîzane li hemberî girtiyên siyasî pêk tên. Ev kirinên li girtîgehan pêk tên sûcên li dijî mirovahiyê ne. Li girtîgeha Kurkçulerê girtî bi awayekî kelepçekirî dibin tuwaletê û hewcedariyên xwe bi vî rengî tînin cih. Her wiha dema doktor wan muayene dike jî destê wan kelepçekirî ye. Li Kiriklarê jî pêkutî zêde dibin

### PÊKANÎNÊN SERDEMA NAVÎN

Girtiyê bi navê Îbrahîm Oz ê di Girtîgeha Tîpa F a Kurkçulerê ya Edeneyê de dimîne di nameya xwe ya ji şaxa ÎHD'ê ya Edeneyê re şandî de pêkanînên li Kurkçulerê şiband pêkanînên Serdema Navîn ku girtî her tim bi kelepçekirî bûn. Oz, di nameya xwe de ragihandiye ku dema wan dibin tuwaleta di hundirê qawîşê de jî kelepçeya destê wan nayê vekirin. Oz, ragihandiye ku dema ew dibin cem doktor û di dema muayenekirinê de kelepçeyên destê wan nayên vekirin.

### BI HEQARETAN RÛMETA MIROV DIŞIKÊNIN

Girtiyên li Girtîgeha Hejmara 2'yemîn a Tîpa F a Kiriklara Bucayê dimînin bi faksekê zordardiyên dijîn nivîsandin. Di faksa ji hêla M. Sîraç Keskîn, Şenol Koç, Melal Yîgît û Onur Işik ve hatiye şandin de zordariyên piştî midûrê girtîgehê yê nû Necmî Uçler hatiye ser kar heta niha, hatin vegotin. Di faksê de tê diyarkirin ku mafê axaftina kurdî, mafê sohbetê, mafê hevdîtinê tê astengkirin û cezayên dîsîplînê yên kêfî têne dayîn. Girtiyan ragihandiye ku heqaret û pêkanînên rûmeta mirov dişikênin her roj zêdetir dibin... RÛPEL - 3




## Îfadedayîna DTP'iyan ne hiqûqî ye, siyasî ye

Nerazîbûnên li hemberî Serokê TBMM'ê Koksal Toptan ên wekî, "Ku DTP'î neçin dadgehê li gorî xalên 83 û 14'emîn ên Makeqanûnê dê bi zorê bibin dadgehê" zêde dibin. Dadmendên nerazîbûn nîşanî biryara gazîkirina 5 DTP'iyan a dadgehê nirxandin, diyar kirin ku biryar ne hiqûqî, siyasî ye. Serokê Komeleya Dadmendên Hemdem Kazim Bayraktar diyar kir ku israra derxistina DTP'iyan a pêşberî dadgehê siyasî ye. Dadmendê Makeqanûnê Levent Korkut jî diyar kir ku di Makeqanûnê de pirsgirêk hene û divê ne kesên ji bo aştiyê nêrînên xwe tînin ziman, rayedarên dewletê yên gelên cuda rencîde dikin bên darizandin. Serokê Baroya Stenbolê yê berê Yucel Sayman diyar kir ku mafê destnedayîna qanûnî ya DTP'iyan heye û bi zorê nikarin wan bibin dadgehê û got: "Ji kîjan xalê encamek çawa derdixin nizanim lê ev ne hiqûqî ye"... RÛPEL - 4

## Kurtay li ser gora xwe hat bibîranîn

Endamê PKK'ê Ferhat Kurtay ku bi sê hevalên xwe re li girtîgeha Amedê bedena xwe da ber agir li Qoserê li ser gora xwe hate bibîranîn. Çalakiya Ferhat Kurtay û hevalên wî weke Agirê Çaran di nava dîrokê de cihê xwe girt. Girseya ku hevalên Kurtay û Şaredarê Qoserê Ferhan Turk jî di nav de ji ber avahiya DTP'ê heta Goristana Çeçen meşiyan. Li ser goristanê axaftinên der barê Kurtay û têkoşîna wî de hatin kirin.



## Banga tevlêbûna mîtîngên 'DTP'ê bêdeng neke'

Xebatên ji bo amadekariyên mîtîngên "DTP'ê bêdeng neke, çekan bêdeng bike, bersivê bide bêpevçûnê" didomin. Ji bo mîtînga dê di 23'yê gulanê de li Wanê bê lidarxistin, Parlamenterê DTP'ê yê Wanê Ozdal Uçer banga tevlêbûnê kir û got dê mîtîng bibe mîtînga azadiyê. Meclîsa Jinan a DTP'ê ya Stenbolê jî ji bo mîtînga di 24'ê gulanê de li Stenbolê bê lidarxistin bang kir... RÛPEL - 4

## Kelepçekirina bi hev a girtiyan qedexe ye lê...

Girtiyên ku li Girtîgeha Girtî ya Jinan a Bakirkoyê dimînin dema têne sewqkirin bi hev têne kelepçekirin. Girtiya bi navê Sema Gul ku li dijî vê pêkanînê derket, rastî mudexaleya leşkeran hat. Li gorî qanûnên heyî divê destê girtiyan bên kelepçekirin, lê kelepçeya zîncir, tilî û zîncira sewqê ya ku girtî bi hev re tên kelepçekirin qedexe ye... RÛPEL - 7

# Ji bo ziman rojname belav kirin



Çalakiyên ji bo Cejna Zimanê Kurdî didomin. Li gelek deveran ji bo balê bikişînin ser astengiyên li ber zimanê kurdî panel, semîner û şahî hatin lidarxistin. Li navçeya Nisêbîna Mêrdînê komeke rêveberên DTP'ê jî di nav de, rojnameya Hawar belav kir. Di dema belavkirina rojnameyê de bang li niştecihên navçeyê hate kirin ku xwedî li zimanê xwe derkevin.

www.arsivakurd.org




# Wa Roşanê Ziwanê Kurdî pîroz bo

## 15 ê gulanî, yew rojo, muhîmo, Elî Celadet Bedrîxan î 15 ê gulanî de Kovarê Hawarî çapkerd, şarê kurdan ra bi vendiş. No, hewara zî, roşanê ziwanê şarê kurdan ra her serre pîroz beno

**ZAZA CEBELÎ**

TZP- Kurdî, emser çerçeweya rojê, zimanê roşanê kurdî, sero xebati xo, 15 ê gulanî ra heyan, 23 ê gulanî de pey ra pey, çalakîyanê xo despêt kena. Meşa, ziwana û panela virazena, TZP-Kurdî, par zî, rojê ziwanî roşanî de, 15 ê gulanî de bi kebûlê roşanê ziwanî bi. Çunkî, 15 ê gulanî, yew rojo, muhîmo, Elî Celadet Bedrîxan î 15 ê gulanî de Kovarê Hawarî çapkerd, şarê kurdan ra bi vendiş. No, hewara zî, roşanê ziwanê kurdî ra pîroz beno, TZP-Kurdî, nêy di serre yan mîyan de, xebata, ziwanê kurdî sero, ziwanê akademî virazeno. No, aşma gulan de, des rojan, mîyan de çalakîya, meşan de panelî, zîyaret, zîyaretkerdiş, ronşbîrê şarê kurda, ra hunerê kuçeyan, akerdişê atolyanê ziwanî, kurdî beno. Sazkerdiş. Sermîyanê nunerê

TZP-Kurdî, vanî, niviskar, Qahir Bateyî, dest nîşan kerd, no, xebata di serrîya, de bajarê vanî de îmza xo vistiş, kerd û despêta xebata, muhîmî day viraştiş, . Vatişê ziwanê kurdî, xebata, sazîyanê pêrina, û Bateyî, vatiş kerd ke, 40 bajaran de rêxistina xebata ziwanê kurdî virazenê. . Vanê wa, no, xebat ra, ziwanê kurdî bibo, ziwanê fermî.

Par, 20008 ê de sûka Amedî de, şarederîya navçeya baglar de, konferansa hidîkarî û perwerdey ziwanê kurdî yewninê bî despêt, Vatişti beştaran konferansi, wa, hide beso, ma, ziwanê perwerdehî vazenê. No beştarê konferansi, bajaran de metropolan ra û bajaran de kurdîstanî ra, 140 mamostey meymanî beştarê konferansî bî. Konferasî tam, hirê rojî dewam kerd, No, koferansi ziwanî zaf muhîm bi, eynî zeman de, herûda yew dîrokî tebişt, no, konferasti, ziwanê kurda sero, heme hewara, bi qalîkrdiş û likolîn bi. Ziwanî sero çi şaşî bî se heyana ewro pêro yew bo, yew nikaşo, û rexne bi, û sernawera biryarî muhîmî girotî. Ziwanî sero, koferasi verêno, herun da yew dîrokîdi bi, . Labelê, no konferas de yew şaşîya muhîmê bî, no, şaşî zî ziwanê zazakî sero, qalîkerdişê zarowey lehçey zazakî sero, xebati, nêamey vatiş, ancax, çen embazan, rexnekerd, rexnede, xo de wa heyana key zarowey zazakî sero xebati nêbena, no hewa zî cûdayeya, cîyayeya. Konferansti, wexto ke biryarê newey girotî, va, wa enkay ra pey, ay ke newe benê mamostey gere her çar zarowa bizanê û bander bi. Wexto ke sonici konferansî rapor ame vendşi no, rapor de, qet yew çî çinêbi. A wext zî mi ancî rexney xo kredî, ay ra bîrê, heyana ewro ziwanî sero zaf panelî, xebata ziwanî virazyay. Ancî, ziwanê zazakî sero, xebati nêbî. Nay ra zî, her hal de, TZP-Kurdî, rexney ma goştaritî. Ez wana kay nay, ray, TZP-Kurdî, linga şeytanî şikiti. No, ray zî, çen panelan de ziwanî kurdî de, panelîsti zazayan de zî ca dayo, ma, bawer kenê ke hide ênkay ra pey zî wa biro dewam.

Bateyî, vatişti xo ra vano, xebata ziwanê kurdî zaf hera bîya, gerek hide, ziwanê akedemîya şarê kurda zazbo. No, akademî de ziwanê kurdî sero, nikaşî û qalikerdişi bi virazyê, wa xebata, akemedîya kudîstanî bêro zazkerdîş, û çend, aşman mîyan de, wa, akedemîya şarê kurda bibo ziwanê netewî.

### Komîsyon û hedefê xora

TZP- Kurdî, heyana enka, xebati ziwanî sero hirê komîsyonî, xebatî kenê,. No komîsyonî heyana ewro, 2000 panelî û semînerî viraştî. Komîsyono diyên zî, pewerdehîya mamosta, perwerdehîya şarê kurdan xebati viraşta. No xebatî de zî 15 mamosteya rey de xebati bî 200'ê newî zî benê hedre, û heyana xebata peynî zî hêvî kenê ke 500ê mamosta perwerde bike mamoste kurdî.

Komîsyona hîrên zî, komîsyona zaneyan bo, ê likolîn bo. No komîsyona zanaye lîkolîna ziwanî sero, meteryali perwedehî, xebata meteryalana, pirtukan bike. Prituka, yewinê, hînker, vejyaya çap bîya, Aya bîn zî ferhengê bêweja û ferhengê bînî zî hedre bo.

**WA ROŞANÊ ROJÊ ZIWANÊ ŞARÊ KURDAN PÎROZ BO. WA BIBO ZIWANÊ FERMÎ.**

---

**Bizmar**



Adil Zozanî
a_zozani@hotmail.com

## Ziman û siyaset

Heta niha helwesta ziman û siyasetê gelek caran bûye mijara nîqaşan. Gelek camêran siyaseta kurd bi îdiaya ku 'li zimanê kurdî xwedî dernakeve' bi tundî rexne kiriye. Dema îtirazek li hemberî rexneya wan hatibe kirin, bi hemû şiyanên xwe ve dest bi êrîşê kiriye.

Lê av diherike û 'yên li ser pirê hewl didin nabînin ku li bin pirê ketiye avê'.

Dewleta tirk, li hemberî me kurdan polîtîkayên Stalînîst bi kar anîn. Îlker Başbûg vekirî dibêje, 'me li hemberî kurdan asîmîlasyon pêk neaniye. Me xwestiye wan entegre bikin. Divê kurd bêne entegrekirin'.

Di van rojên rojên ku em Cejna Ziman pîroz dikin de, hêja ye ku ev meseleya entegrasyonê baş bê vekolan. Erê gelo, entegrasyona ku Başbûg qala wê dike çi ye? Camêrên ku heta niha 'kuxîna' siyaseta kurd jî ji bo xwe kirine mijara rexneyê li ser vê mijarê tiştek negot. Helwesteke dijberî vê daxuyaniyê bi raya giştî re parve nekir.

Dibe, bê gotin ku her rewşenbîrekî kurd potansiyela dijberbûna polîtîkayên serwerî Kurdistanê di hundirê xwe de dihewînin. Aşkera nekin jî xwedî vê helwestê ne. Rast e, ev potansiyela rewşenbîrên kurd a li hemberî mêtinkarên welat heye. Lê mixabin, dema dora nîşandana helwestê mijara gotinê be, gavekê li paş gel tê sekinîn.

Entegrasyona ku Îlker Başbûg qala wê dike, qonaxeke ji bişaftinê wêdetir e. Entegrasyona ku qala wê tê kirin îradî ye. Dewleta tirk tim xwestiye ku me kurdan di çarçoveya qebûlên xwe de bişibîne xwe. Dema siyaseta kurd dibêje, 'dewlet dixwaze kurdên xwe biafirîne'; mijara gotinê ev bû.

Entegrasyona dewlet qala wê dike û daxwazên gelê kurd bi çu awayan nagehejin ser hev. Qala du tiştên diberî hev tê kirin.

Nabe ku gelê kurd entegrasyoneke îradî qebûl bike. Bedelên ku heta niha di vê oxirê de hatine dayîn jî vê rastiyê tekûz dikin. Gelê kurd careseriyeke li gorî daxwazên xwe ya bi rûmet dixwaze.

Di vê noqteyê de danûstandinên ramyarî yên rewşenbîrên kurd pir girîng in. Beriya her tiştî rewşenbîr di gelek waran de dikarin pêşiyê li ber siyasetê jî vekin.

Bedelên gelê kurd di nava pêlên siyaseta kurd de di oxira doza welat de dayîn, di ser her tiştî de ne. Livûtevgereke siyasî ya li gorî bersivdayina ji bo van bedelan girîng e. Di vê noqteyê de yekûyeko divê polîtîkaya DTP'ê ji nêz ve bê şopandin. Lewre, bivê-nevê DTP îro ji bo çareseriya pirsgirêka kurd pira diyalogê ya bi Enqereyê re ye.

DTP, îro di çarçoveya meşrûbûnê de teşe dide polîtîkayên xwe. Bi vê polîtîkaya xwe qalibên dewleta tirk ên bi qanûnan bê wate tên hiştin. Mînaka herî ber bi çav di Qanûna Partiyên Siyasî de xala têkildarî zimanê siyasetê ye. Di vê xalê de têgotin ku 'partiyên siyasî ji bilî zimanê tirkî nikarin bi zimanekî din siyasetê pêk bînin'.


Beriya hilbijartinê DTP'ê ev qalib şikand. Ligel ku gelek camêran helwesta DTP'ê wekî 'oportûnîzma ziman' navkir jî- DTP'ê bi rêbazên meşrû qanûna dewletê mehkûm kir. Daraza tirk di vê xalê de xitimî.

Bitenê ne di mijara ziman de, xeta meşrûbûnê ya wekî 'bêîtiatiya sivîl' hatiye navkirin divê di hemû warên jiyana siyasî de serwer bibin. Refleksê siyasî yên heyî vê heviyê didin mirov. Encax bi vî şêweyî em kurd dikarin rê li ber entegrasyona li gorî dilê serweran teşe hatiye dayîn li ber xwe bidin.

Mijara ziman yek ji van bingehên berxwedanê ye. Siyaset di warê karanîna ziman de erkdareke xwezayî ye. Divê ji niha şûnde zimanê siyaseta kurd bi giştî bibe zimanê kurdî.

---

**Quncikê Azad**



Feleknas Uca
feleknasuca@web.de

## Di berdana Roxana Seberî de rola YE'yê

Rojnamevana Amerikayê Roxana Seberî, ya ku ji ber tawanbarkirina sûcê casusiyê 8 sal ceza girtibû di roja 11'ê gulanê de hat berdan.

Wek tê zanîn cezakirina Seberî di navbera DYA her wiha YE'yê û Îranê de bûbû sedema krîza dîlomatîk.

Bi baweriya min di berdana Roxana Seberî de rola biryarên YE'yê cihêkî girîng digire.

Parlamena Ewropayê di joja 7'ê gulanê de li ser rewşa Îranê û bi taybetî jî ji bo berdana Seberî bîryarên jêrîn stand.

Çend mînakên girîng ya bîrayarên Parlamena Ewropayê:

Parlaman bal dikşîne ser ku: Roxana Seberî, ya ku eynî demê de ji bo Raydoya ABC, BBC uwd karê rojnemevanî dikir, ji aliyê dadgeha şoreşê di roja 18'ê nîsanê bi 8 salan hatî bû cezakirin. Roxana Seberî piştê girtina xwe, penc hefte nikarîbû bi parazerên xwe re bipeyîve û dadgehe wî ne di bin pergala dadmendiyê de meşiya bû;

Doza temyîzê ya Seberî nîşan da ku tu xalên doznameyê ne hiqûqî bûn.

Roxan Seberî di 1'ê Gulanê de dest bi greva birçîbûnê kir û li gor nûçeyan rewşa wê ya tendirûstî ber bi ne başiyê diçû;

Rojnamevan Maryam Malek, yek ji endamên Kampanya Wekheviyê „Mîlyonêk Îmze" û zedehejmarêk endamên din di 25'ê nîsanê hatine girtin û malbata wê nikare ku 10.000 EUR kefalet bide û Malek were berdan;

Polesên Îranê di meşa 1'ê Gulanê de hêriş birin li ser mêşvanên aştîxwaz û li gor nûçeyan 100 kes hatine girtin;

Her çiqas ku Serokê Dadgeha Bilinda ya Îranê di roja 19'ê nîsanê de bîryar dabû ku di nav 2 mehan de kes nayên îdamkirinê, di roja 1'ê Gulanê de di girtîngeha navendî ya Rasht de Delara Darabî hatiye îdamkirinn û temena wê di dema sucê de bin 18 salî de bû.

Rewşa Îranê, -her çiqas Îran qebûl kirî bû ku, mafê mirovan di sewiya mafên navnetewî bipejirîne- ji sala 2005'an peyve ji aliyê mafê hemwelatiyan û azadiyên polîtîk ve ber bi nebaşiyê diçe.

Parlamena Ewropayê:

Bîryara dadgeha şoreşê ya ku di roja 18'ê nîsanê de 8 sal ceza dayiye Roxana Seberî, şermezar dike;

Bal dikşîne ser rewşa dadgeha Seberî ya ku di nav ne noşdariyê de derbas bûbû.

Taleb dike ku di dadgeha temyîzê ya 12'ê gulanê de Roxana Seberî bê şert û şûrt were berdan.

Li ser îdamkirina Dilara Darabîs di nav şaş û matmayiyê de ye û daxwaz ji Îranê dike ku îdamên kesên ciwan bide sekinandin.

Sîstema kefaletê ya ku dibe sedem ku devê kesên rexnegir were girtin û pêvajoya reforman werin alozkirin, şermezar dike. Daxwaz dike ku Maryam Malek bi lezgînî were berdan.

Dawxaz dike ku çalakvanên mafê karkeran wek Mansour Osanloo, Ebrahîm Maddadî, Farzad Kamargar û Ghaleb Hosseini werin berdan.

Ji hikûmeta Îranê daxwaz dike ku, hemû peymanên mafê mirovan yên navnetewî yên ku Îran jî pejirandine, di pratîkê de bipejirîne û ber cezayên recimkirinê bigre û recimkirina Valî Azad şermezar dike…

Bîryarên rast û bi hêz.

Lê çima ev bîryar ji bo Tirkiyê ya ku di salên dawiyê de mafê mirovan li welatê kurdan binpê dike nayên girtîn. Ji bo Îran dîplomasiya şer; ji bo Tirkiyê dîplomasiya nerm! Lê heta kengî?

**HAWAR**
**Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.**
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
**Bedri ADANIR**
***Adres:***
Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
***TEL:*** 0 (412) 229 00 30
***Fax:*** 0 (412) 229 00 39

Baskı ***(ÇAP):***
***Stenbol:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
***Tel:*** 0 (212) 580 63 80
***Edene:*** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. ***No:*** 44 Seyhan Edene
**Yayın Türü:** Süreli

# Li Guantonamoyên Tirkiyeyê çi dibe?

## Li girtîgehên Tirkiyeyê ji ber feraseta faşîzane ya dewletê pirsgirêk çareser nabin û girtî wekî li girtîgeha Guantonamoyê restî îşkenceyên cur bi cur tên û di girtîgehan de sûcên mirovahiyê pêk tên

Girtiyê bi navê Îbrahîm Ozê di Girtîgeha Tîpa F a Kurkçulerê ya Edeneyê de, girtiyên di Girtîgeha Hejmara 2'yemîn a Tîpa F a Kiriklarê ya Bucayê de dimînin bal kişandin ser pêkanînên kêfî yên li girtîgehan û wiha gotin: "Gule bera me didin, em tim bi zincîr û kelepçe ne, nahêlin em bi dayikên xwe re bi kurdî bipeyivin, nahêlin rojname, pirtûk û kovarên kurdî bikirin; ev Ev pêkanînên wiha li êsîrên şer jî nayên kirin."

Li Girtîgaha Tîpa F ya Edeneyê binpêkirinên mafan û pêkutiyên li dijî girtiyên siyasî bi dawî nabin. Girtiyê bi navê Îbrahîm Oz, di nameya 11'ê mehê ji Şaxa ÎHD'ê ya Edeneyê re şand de girtîgeh şibandiye Girtîgeha Guantanamo ya li Amerîkayê.

**'Me bi kelepçe dibin tuwaletê'**

Oz, derbirî ku dema wan dibin tuwaleta di hundirê qawîşê de jî kelepçeya destê wan nayê vekirin û wiha dom kir: "Tevî ku gelek tedbîrên ewlekariyê hene jî deriyê tuwaletê tê miftekirin. Dema pêdiviya me hebe em neçar dimînin bang li leşkeran bikin. Dema em gazî dikin jî demeke dirêj bersivê nadin. Li gorî kêfa leşkerên rayedar ên li wir bersiv tê dayîn. Dema deriyê tuwaletê tê vekirin jî leşkerek li ber derî disekine û bi şiklekî destkelepçekirî em diçin tuwaletê. Dema me dibin cem bijîşk û di dema muayenekirinê de kelepçeyên destê me nayên vekirin. Heke em muayeneya bi vî şiklî qebûl nekin der barê me de lêpirsîn tê vekirin."

**'Leşkerê nobedar gule bera me da'**

Oz, anî ziman ku ligel ku hucreyên rawestînê yên dadgehê li qatê bodrumê ne li wir jî kelepçeya destê wan nayê vekirin û wiha derbirî: "Mirov nikare van pêkanînan bi pîvanên mirovahiyê îzah bike. Em nikarin wekî zîndanên qirnê navîn her tim kelepçe û zincîrkirinê qebûl bikin. Pêkanînên wiha li hemberî leşkerên dijmin ên esîr tên girtin jî nayên kirin. Qebûlkirina van pêkanînan sûce mirovahiyê ye."

**Li Guantonamoyê jî ev tişt nîn in**

Oz, di nameya xwe de destnîşan kir ku Girtîgeha Guantanamo ya li Amerîkayê her tim tê rojevê û wiha pê de çû: "Lê tiştên li vir pêk tên ne kêmî wê ye û hîn xirabtir e. Leşkeran ji qulubeyek nobetçiyan gule berdan odeyek me. Ji aliyê hin gardiyanên nîjadperest ve hevalên me bi mirinê tên tehdîd kirin." Oz, anî ziman ku ji hêla zagonî ve li hemberî binpêkirinên mafan dê serî li hemû rê û rêbazan bidin.

**Li Kiriklarê Ewlehiya jiyanê nîn e**

Girtî û hikûmxwarên li Girtîgeha Hejmara 2'yemîn a Tîpa F a Kiriklara Bucayê dimînin bi faksek, zordardiyên dijîn nivîsandin. Di faksa ji hêla M. Sîraç Keskîn, Şenol Koç, Melal Yîgît û Onur Işik ve hatiye şandin de zordariyên piştî midûrê girtîgehê yê nû Necmî Uçler hatiye ser kar heta niha hatin vegotin. Di faksê de tê diyarkirin ku mafê axaftina kurdî, mafê sohbetê, mafê hevdîtinê tê astengkirin û cezayên dîsîplînê yên keyfî tên dayîn.

**Ewlehiya jiyana me nemaye**

Ji girtiyan M. Sîraç Kesekîn di faksa şandî de diyar dike ku li girtîgehê her tim bi gelek pirsgirêkan re rû bi rû dimînin û wiha domand: "Em ji ber van pirsgirêkan êdî bi fikar in. Ewlehiya canê me nema ye. Em ji saziyên mafên mirovan dixwazin ku bi lezgînî heyetekê bişînin girtîgehê û van binpêkirinan lêkolîn bikin. Em jiyana xwe di tehlîkeyê de dibînin."




**Riyên hiqûqê li me girtine**

Girtiyê bi navê Kemal Yîgît jî diyar kir ku pirsgirêkên girtîgehê û zordarî hatine astek nayên tehemûl kirin û balkişand ser van pirsgirêkan: "Ji ber ku dema ez pirsgirêkan binivîsim, nahêlin ez faksê bişînim. Ji ber vê yekê ez nikarim zordariyên li me tên kirin binivîsim. Çiqas me serî li riyên hiqûqî dabe, pirsgirêkên me ew qas mezintir bûne. Ji bo tiştên xirab li vir çênebin, em bang li rêxistinên mafên mirovan dikin ku bên lêkolînê bikin."

**Em nikarin bi kurdî biaxivin**


Girtiyê bi navê Onur Işik jî diyar kir ku ligel daxuyaniyên Serokomar Gul, Serokwezîr Erdogan û weşana TRT'ê jî girtî û hikûmxwar nikarin bi malbatên xwe re kurdî biaxivin. Işik diyar kir ku qedexeyên li hemberî kurdî zêdetir dibin.

**Rojnameyên kurdî nadin me**

Işik diyar kir ku mafê hevdîtinê, sînorkirina pirtûk û kovaran û rojnameyên kurdî bi tu awayî nadim me. Nameyên kurdî, nivîsek bi kurdî hatibe nivîsandin destûrt nadin ku em bişînin der.

**Li vir jiyan bûye îşkence**

Işik destnîşan kir ku heta mafên herê biçûk jî tên binpêkirin û wiha got: "Guherandina odeyê jîkirine îşkence. Mafê sohbetê tê, cihên hevpar tên asteng kirin. Pêkanîn û zordariyên li ser me jiyan wergerandine îşkenceyê. Tu serlêdanên me nayên bersivandin û cezayên hucre û dîsîplînê zêde bûne. Hevalên me rastî êrîşên fîzîkî tên. Rûmeta mirov dişkînin . Em li vir diyar dikin ku sedemê hemû tiştên neyînî rêveberiya girtîgehê ye."


GUMHURİYET BAŞ SAVCILIĞINA
BEYNÜSEBAP
29 Mart 2009 tarihinde yapılan mahalli idareler genel seçimlerinde, teşkilatımız yani Demokratik Toplum Partisi belediye başkan adayının kazandığı belli olduktan sonra [illegible] olarak akşam saat 21:45 civarında Akparti belediye başkan adayı Kamil [illegible] taraftarları aynı zamanda yakın akrabaları olan kişilerce öncelikle teşkilatımız Demokratik Toplum Partisi binası taş sopa ve ellerine geçirdikleri diğer malzemelerle parti binası tahrip edilmiş ve teşkilat binasının önünde bulunan [illegible] arkadaşların araçları
1. Belediye meclis üyesi adayı [illegible] ait 73 EA 150 plakalı
2. Seçim gözlemcisi [illegible] Akdağ'a ait 27 E 7703 plakalı araç
3. Gözlemci Reşit Karahan'a ait 73 AC 071 plakalı araç
4. Seçim müşahidi [illegible] Arslan'a ait 27 YK 165 plakalı araç
5. Seçim müşahidi [illegible] ait 27 TY 442 plakalı
araçlar çeşitli yerlerinden tahrip edilmişlerdir.
Bu olayın akabinde yine Demokratik Toplum Partisi belediye meclis üyesi adayı olan [illegible], kardeşi ve babasına ait olan üç katlı bina yine belirtilen şahıslar tarafından taş ve sopalarla saldırı düzenlenmiş ve iki kat tahrip edilmiştir.
Olaylarla ilgili emniyet güçlerince tutanaklar düzenlenmiş ev ve araç sahiplerin beyanları alınmış ve tahrip olan yerlerin fotoğraf ve görüntüleri çekilmiştir. Olay sırasında Demokratik Toplum Partisi ilçe binasında bulunan şahısların isimleri ekteki listededir. Bunları tanık olarak beyanlarına baş vurulmasını talep ediyoruz.

**'Serdema derbayan tê jiyîn'**

Şenol Koç û jî destnîşan dike ku pêvajoyek wekî ya serdema darbeyan li girtîgehê tê jiyîn û wiha pê de çû: "Serlêdanên me yên zagonî encam nadin. Li ser girtiyan teror tê meşandin. Ewlehiya canê me tune ye. Êrîşên fîzîkî dest pê kirine. Jiyana li vir ji me re rewa dibînin ne jiayn e. Em xwe wekî rehîneyan hîs dikin. Bila saziyên mafên mirovan hîstiyar bin û li girtîgehê lêkolînê bikin."

**Îro bi dozger re diaxivin**

Girtiyên li Girtîgeha Hejmara 2'yemîn a Tîpa F a Kiriklara Bucayê piştî wezîfedarkirina midûrê nû yê girtîgehê Necmî Uçler gelek caran ev gilî kiribûn. Hike ji aliyê dozgerê girtîgehê ve tu astengiyek neyê derxistin di têkildarî mijarê de îro Şaxa ÎHD'ê ya Îzmîrê, TÎHV û ÇHD bi heyetekê dê bi dozgerê girtîgehê re hevdîtinê pêk bîne. **EDENE - ÎZMÎR / DÎHA**

## Polîsan li Geverê kesek binçav kir

**COLEMÊRG**

Li navçeya Geverê ya Colemêrgê kesê bi navê Rifat Babat hate binçavkirin. Li gorî agahiyan, li Geverê ciwanê bi navê Rifat Babat li navenda navçeyê ji aliyê polîsan ve hate binçavkirin. Hate diyarkirin ku Babat ji ber pîrozbahiyên Newroza 2008'an hatiye binçavkirin û ew birin midûriyeta polîsan a navçeyê.

## Li herêma Zapê êrîşa topebaranê

**BEHDÎNAN**

Li gorî agahiyên ku hatin bidestxistin artêşa tirk Zapê bi bi topên obus bombebaran kir. Navenda Ragihandina Hêzên Parastina Gel aşkera kir ku êrîşa topebarana obusan roja 18'ê gulana 2009'an de saet di 22:00 û 23:00'an de topebarana obusan pêk hat. Di hedefa vê êrîşê de gunê Kerhe ya Nerweyê, Çiyayê Reş û Girên Rûbar hebûn.

## Ji leşkerê Îranê înfaza bê daraz

**WAN**

Li sînorê Elbaka Wanê kesê bi navê Faysal Meyalpur ji aliyê leşkerên Îranê ve bêyî ku bê darizandin hate înfazkirin. Li gorî agahiyên ji herêmê Faysal Meyalpûr ê ji bajarê Selmasa rojhilatê Kurdistanê dijî û bavê 10 zarokan e li ser sînorê Elbaka Wanê dema dixwest ji sînor bibore ji aliyê leşkerên Îranê ve hat gulebarankirin. Di encamê de Faysal Meyalpur bi giranî birîndar bû û ew rakirin nexweşxaneyê. Li ser sînor kurdên xizan bazirganiya çay, cigare, benzîn, şekir û her wekê din dikin. Lê ji ber vê gelek caran ew tên kuştin û birîndarkirin.

## Dadgeh cerdevanan nadarizîne

Rêxistina DTP'ê ya navçeya Elkê piştî ku DTP'ê di hilbijartina herêmî ya 29'ê adarê de şaredariya Elkê qezenc kir ji ber ku rastî êrîşa cerdevanan û AKP'iyan hatibû gilî kir. Lê giliya di Serdozgeriya Komarê ya Elkê de kir bê encam ma. Ligel ku meh û nîvek di ser bûyerê de derbas bûye, der heqê kesên êrîşî DTP'ê kirine de tu lêpirsîn nehatiye destpêkirin.



Rêveberê Rêxistina DTP'ê ya navçeyê Rahmî Ataman da zanîn ku piştî hilbijartin qezenc kirine di pêşengiya Sercerdevan Reşît Durmuş de cerdevan û AKP'iyan êrîşî mal û rêxistina wan kiriye û di encamê de gelek hevalên wan birîndar bûne û malên wan xisar dîtine. Ataman derbirî ku polîsan pêşî li êrîşê negirtiye, lê hevalên wan xwînsar tevgeriyane û bersiv nedane êrîşan. Ataman got: "Piştî bûyerê me serî li Serdozgeriya Komarê ya Elkê da. Lê ev meh û nîvek e tu doz nehatiye vekirin. Hemû rayedarên dewletê cerdevanan diparêzin. Ev rewşeke derhiqûqî ye."

**'Li Elkê feraseta Zankirtê'**

Ataman, diyar kir ku gelek hevalên wan ên di saziyên cemaweriyê de dixebitin ji kar hatine derxistin û wiha pê de çû: "Pergal û cerdevan ji bo ku me tune bikin çi ji destê wan tê dikin. Heke tedbîr neyên girtin û çek ji destê cerdevanan neyên derxistin dibe ku bûyerên wek Gundê Zankirtê li vir jî xwe dubare bikin. "

**"Dewlet cerdevanên xwe diparêze'**

Serokê Rêxistina DTP'ê ya navçeyê Recep Hakseven, anî ziman rewşeke derhiqûqî tê jiyîn û wiha pê de çû: "Divê ev bêhiqûqî di zûtirîn demê de bi dawî bibe. Serdozgeriya Komarê ya Elkê alî digire. Çend roj berî niha em dîsa rastî êrîşa cerdevanan hatin. Cerdevan dixwazin li navçeyê kaosekê ava bikin. Cerdevan vê hêzê ji çekên dewletê digirin. Lazim e pêşî li vê sosretê bê girtin." **ŞIRNEX / DÎHA**

## Bîngol got 'diyalog' lê dadgehê ceza lê birî

Rêveberê Navenda Giştî ya Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP) Abdulkerîm Bîngol, bi hinceta di axaftina xwe ya di pîrozbahiya Newroza 2008'an a li Îzmîrê pêk hatî de, "Pesnê sûc û sûcdar daye" rastî 10 meh cezayê girtîgehê hat.

Der barê Rêveberê Navenda Giştî ya BDP'ê Abdulkerîm Bîngol de bi hinceta axaftina di Newroza 2008'an a li Îzmîrê pêk hatî de "Pesnê sûc û sûcdar daye" lêpirsîn hatibû vekirin. Piştî lêpirsînê der barê Bîngol de li Dadgeha Cezaya Sulh a Îzmîrê doz hate vekirin. Dadgehê di danişîna di 18'ê gulana 2009'an de li Bîngol bi hinceta ku di axaftina xwe de "Pesnê sûc û sûcdar daye" 10 meh cezayê girtîgehê birî.

**'Serokomar heman tiştan dibêje'**

Bîngol, di axaftina xwe ya di Newroza Îzmîrê de, bal kişandibû ser rawestandina operasyonan û daxuyandibû ku ancax pirsgirêka kurd bi riya diyaloga di navbera aliyan de bê çareserkirin. Bîngol tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û pêkutiyên li girtîgehan jî şermezar kiribûn. Bîngol nerazîbûn nîşanî biryarê da û da zanîn ku niha Serokomar Abdullah Gul dibêje, "Pirsgirêka herî girîng a Tirkiyeyê pirsgirêka kurd e û divê bê çareserkirin" lê dadgeh bi boneya heman gotinan ceza dide." Bîngol, destnîşan kir ku di navbera biryara der heqê wî de hatiye dayîn û pêvajoya niha de nakokî heye. Bîngol derbirî ku biryara dadgehê fêdeyê nade Tirkiyeyê. **WAN / DÎHA**

## Çawişê pîspor li Amedê mirî hat dîtin

Li navçeya Yenîşehîra Amedê çawişê pîspor ê bi navê Omer Ozdemîr (30) di mala xwe de mirî hate dîtin. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin li navçeya Yenîşehîra Amedê li kolana Rizvanaga di avahiya Baharê de pisporekî çawiş ku di Fermandariya Cendermeyan de peywirdar bû li mala xwe mirî hate dîtin. Hate hînbûn ku Ozdemîr bavê zarokekî ye û dema ku hevsera wî hatiye mal cesedê Ozdemîr dîtiye. Ji ber ku birîna guleyê li serê heye der barê bûyerê de ji bo zelalkirina rewş întîhar e an na, lêpirsîn hat destpêkirin. **AMED**

## Têkoşîna xwe dê bidomînin

Komeleya Piştgirî û Alîkariya Malbatên Xizmên Xwe Windakirin (YAKAY-DER), Komîteya li Dijî Windakirinê ya Naventeweyî (ICAD) û ÎHD'ê, bi munasebeta Hefteya Têkoşîna li Hemberî Windayên di Binçavan de, ji bo Hasan Ocak û Ridvan Karakoç li Taxa Gaziyê meşek li dar xistin. Endamên, ESP, SDP, DTP'ê û parazvanên mafên mirovan jî di nav de bi sedan kesên li ber Cemxaneya Gazî hatin cem hev, ber bi Goristana Gaziyê ve meşiyan. Di dema meşê de wêneyên Hasan Ocak û Ridvan Karakoç ên di ala 1995'an de di binçav de hatin windakirin û wêneyên windayên din hatin rakirin.

Girseya ku di meşê de pankartên "Yên winda kirine bila bên darizandin", "Bila ji kiryarên windayan dewleta kontrgerîla hesab bê pirsîn" hildan, bênavber sloganên, "Me bedel da em dê bedel bidin", "Hasan Ocak dijî ji fermandar re hezar silav", "Dewleta qatil dê hesab bide" û "Hêrsa dayikan dê qatilan bifetisîne" berz kirin.

Birayê Ridvan Karakoç Hasan Karakoç li goristanê daxuyanî da, da zanîn ku ev 15 sal in ji bo windayan têkoşînê didin. Karakoç, derbirî ku heta dewlet hesaba windayan bide jî dê têkoşîna xwe bidomînin. Xizma windayan Hanim Tosun jî bi kurdî diyar kir ku bi hezaran windayên wan hene û wiha axivî: "Ew ji ber ziman û nasnameya xwe hatin qetilkirin. Ku îro em dikarin kurdî biaxivin ev bi saya serê wan û têkoşîna wan e. Heta dewlet aqûbeta windayan kişf dike em dê têkoşîna xwe bidomînin." Birayê Hasan Ocak, Alî Ocak jî diyar kir ku windakirin polîtîkaya dewletê ye. **STENBOL / DÎHA**

www.arsivakurdi.org

# Dadmend: Gazîkirina DTP'iyan a dadgehê ne hiqûqî, siyasî ye

**Nerazîbûnên li hemberî biryara ku DTP'î bi zorê dê bibin dadgehê didomin. Dadmendan diyar kir ku ev biryar ne hiqûqî ye, siyasî ye. Serokê Baroya Stenbolê yê berê Yucel Sayman got ku di Makeqanûnê de mafê destnedayîna qanûnî ya parlamenterên DTP'ê heye**

Dadmendên nerazîbûn nîşanî biryara gazîkirina 5 DTP'iyan a dadgehê nirxandin, diyar kirin ku biryar ne hiqûqî, siyasî ye. Serokê Komeleya Dadmendên Hemdem Kazim Bayraktar diyar kir ku israra derxistina DTP'iyan a pêşberî dadgehê siyasî ye. Dadmendê Makeqanûnê Levent Korkut jî diyar kir ku di Makeqanûnê de pirsgirêk hene û divê ne kesên ji bo aştiyê nêrînên xwe tînin ziman, rayedarên dewletê yên gelên cuda rencîde dikin bên darizandin.

Nerazîbûnên li hemberî Serokê TBMM'ê Koksal Topman ên wekî, "Ku DTP'î neçin dadgehê li gorî xalên 83 û 14'emîn ên Makeqanûnê dê bi zorê bibin dadgehê" zêde dibin. Serokê Baroya Stenbolê yê berê Yucel Sayman diyar kir ku mafê destnedayîna qanûnî ya DTP'iyan heye û wiha axivî: "Ji ber vê bi zorê nikarin bibin dadgehê. Ji kîjan xalê encameke çawa derdixin nizanim lê ev ne pêkanîneke hiqûqî ye. Divê tu kes jî ji ber nêrînên xwe neyê darizandin." Hîndekarê Zanîngeha Hacettepeyê Levent Korkut jî anî ziman ku Makeqanûn bi pirsgirêk e û tê de valahî hene. Korkut wiha axivî: "Ji bo darizandina parlamenteran hewceyî bi biryara Meclîsê heye. Mafê destnedanê pirsiyarkirin û girtinê jî dihundirîne. Her wiha xala 83'emîn dibêje 'ku berî bê hilbijartin lêpirsînê dest pê kiribe' darizandina wan dom dike."

**'Pirsgirêkên azadiya ramanê hene'**

Korkut diyar kir ku li Tirkiyeyê di warê azadiya ramanê de pirsgirêkên girîng hene û ev tişt gotin: "Gelek caran 'alîgiriya terorê' û azadiya ramanê tev li hev dibe. Ez bi giştî zêde erênî li mafê destnedayînê nabin. Lê heta li Tirkiyeyê di warê hiqûqî de serdestiya hiqûqê neyê avakirin, mafê destnedayînê yê parlamenteran tiştekî neçarî ye. Di vî warî de biryara DMME'yê ya der barê senatorekî îspanyol de heye. Heta DTP bi awayekî fîzîkî alîkariya çekan neda komekê nakeve nav çarçoveya terorê. Dozên hatine vekirin ji ber axaftina kurdî ne. Heta kesek nebêje 'Ez piştgiriyê didim şerê çekdarî' nayê darizandin. Ev ji bo welatiyên normal jî divê derbas be. Xalên Makeqanûnê yên 83 û 14'emîn jî her tim xelet tên şîrovekirin. Xala 83'yemîn ji bo nijadperestiyê, an jî heqareta li hemberî nijadekî din tê bikaranîn. Ku aştiyê biaxive, kurdî biaxive ev meseleyên hatin nîqaşkirin û bi encam bûne. Ev xal ji bo van nayên bikaranîn."

**'Ji bo rencîdekirinê ye'**

Serokê Komeleya Dadmendên Hemdem Kazim Bayraktar jî diyar kir ku tu mecbûriya parlamenterên xwedî mafê destnedayînê tune ye ku biçin îfade bidin.

Bayraktar wiha axivî: "Niha sedemên cuda tên nîşandan. Ji bo hewceyiyeke hiqûqî bi cih bînin nikarin gazî DTP'iyan bikin. Ji bo di warê siyasî de rencîde bikin gazî wan dikin. Lê pirsgirêk siyasî ye. Di salên dawî de daraz her diçe biryarên siyasî dide. Di vê israra gazîkirina dadgehê armanceke hiqûqî tune ye. Ji bo rencîdekirinê ye. Ez biryara neçûyîna parlamenteran di cih de dibînim. Dozên niha dikin sedema gazîkirina parlamenteran, berî niha li AÎHM'ê hatine dîtin û Tirkiye mehkûm bûye. Dozên berî niha hatine dîtin û îfadeya wekîlan hatiye girtin. Ji ber vê DTP'iyan berî niha gelek caran îfade daye." **ENQERE / DÎHA**

# 23'ê gulanê Wan, 24'ê gulanê Stenbol

Parlamenterê DTP'ê yê Wanê Ozdal Uçer ku ji bo mîtînga dê di 23'yê gulanê de bi slogana "DTP'ê bêdeng neke, çekan bêdeng bike, bersivê bide bê pêvçûniyê" li Wanê bê lidarxistin banga tevlîbûnê kir, wiha got: "Mîtînga dê di 23'ê gulanê de pêk were divê bibe mîtînga azadiyê û coşa Newrozê bide nîşandan." Meclîsa Jinan a DTP'ê ya Stenbolê, banga tevlîbûna mîtînga bi armanca pûçderxistina operasyona li hemberî DTP'ê pêk hatî di 24'ê gulanê de, bi slogana "DTP'ê na çekan bêdeng bikin" tê li darxistin, kir.



*Meclîsa Jinan a DTP'a Stenbolê bi daxuyaniyeke çapemeniyê banga mîtînga ku dê di 24'ê mehê de li qada Çaglayanê li dijî pêkutiyên li hemberî DTP'ê bê lidarxistin, kir.*

Parlamenterê DTP'ê yê Wanê Ozdal Uçer, ji bo beşdariya mîtîngê banga tevlêbûnê kir. Uçer, diyar kir ku bi deh sal in ji bo vîna gelê kurd bê şikandin û pêkûtî li ser civaka kurd bên meşandin dewlet polîtîkayek pergalî dimeşîne. Uçer, destnîşan kir dê kurd li dijî pêkutiyan rawestin û wiha got: "Di hilbijartinan de ji bo vîna gelê kurd bê şikandin, astenga benda ji sedî 10 ku li tu welatî nehatiye dîtin li ser gelê kurd hate meşandin. Lê tevî hemû pêkutiyan hem di hilbijartina giştî ya 22'yê tîrmehê de û hem jî di hilbijartina herêmî ya 29'ê adarê de gelê kurd li vîna xwe xwedî derket û pêkutî vala derxistin."

**'Dixwazin xebatên me asteng bikin'**

Uçer, bal kişand ku rêveberên partiya wan bi şiklek bêhiqûqî û metnesîz hatin binçavkirin û hatin girtin. Uçer, destnîşan kir ku girtina rêveberên wan di rêveberiya partiya wan de valahiyek pêk hat. Uçer, anî ziman ku armanca van pêkûtiyan pêk tînin jî ew bû ku valahiyek çêkin û xebatên meclîsê asteng bikin.




Uçer, daxuyand ku sedema esasî ya êrîşan astegkirina têkoşîna gelê kurd e û wiha pê de çû: "Me jî ji bo valaderxistina van armanca, xwedîlêderketina vîna gelê kurd û şermezarkirina van pêkanînan hin çalakî lidar xistin. Çalakiyên greva birçîbûnê, nobet girtin, meş û daxuyanî hatin dayîn. Ji ber heta niha hevalên me yên rêveber nehatine berdan her ku diçe çalakiyên me berfireh dibin."

Uçer ku da zanîn heta pêkutî bi dawî nebin dê çalakiyên wan jî dom bikin, derbirî ku wekî DTP'ê ji bo şermezarkirina pêkutiyên heyî û nîşandana vîna çareseriyê dê 2 mîtîngên herêmî lidar bixin. Uçer, wiha axivî: "Wekî DTP'ê yek li Wanê ya din jî li Stenbolê em dê 2 mîtîngên herêmî pêk bînin. Bi taybetî dê ji hemû bajarên herêmê tevlêbûna mîtînga Wanê çêbibe. Em bawerin dê gelê me tevî mitîgê bibe û bi hîstiyar nêzîk bibe. Em bang li hemû gel dikin ku beşdarê mîtînga dê di 23'ê gulanê de li qada Newrozê ya li pişt Keleha Wanê bê lidarxistin bibin."

**Banga ji bo Mîtînga Stenbolê**

Meclîsa Jinan a DTP'a Stenbolê, amaderkariya mîtînga bi armanca pûçderxistina operasyonên li hemberî DTP'ê ku niha jî didomin dê di 24 gulanê de li Qada Çaglayanê bi slogana "DTP'ê na çekan bêdeng bikin" li dardixe, didomine. Komîsyonên ji bo amadekariyên mîtîngê hatibûn damezrandin niha li navçe û taxan cîvînên gel li dar dixin. Her wiha ji bo tevlîbûna mîtîngê tevî ku belavok tên belav kirin, daxuyaniyên çapameniyê jî tên lidarxistin. Mîtînga ku gelek rêxistinên civakî yên sivîl û sendîka jî piştgiriyê didinê, rêxistinên DTP'ê yên li bajarên rojavayê jî hevserokên DTP'ê Ahmet Turk, Emîne Ayna û parlementerên DTP'ê jî tevlî dibin. Endama Meclîsa Jinan Yildiz Aktaş, di derheqî mîtînga ku tevlîbûna 150 hezar kesî tê armanç kirin agahî dan. Aktaş, daxuyand ku bi operasyonan gelek hevalên wan hatin girtin û destnîşan kir ku dixwazin danahevên kurdan yên 30 salî bi operasyonan pûç derbixin.

**'Gel dê têkoşîna xwe bidomîne'**

Aktaş, diyar kir ku di demên berê de li ser rêxistinên ciwan û jinan pêkutiyên hîn girantir dihatin meşandin û piştî her operasyonê xebat hîn serkeftîtir dihatin bi rêve birin. Aktaş, diyar kir ku di mîtîngê de dê têkoşîna gelan a hevpar danên holê û wiha domand: "Em bang li kesên alîgirê aştiyê û demokrasiyê dikin ku tevlî mîtînga di 24'ê gulanê li Qada Çaglayanê bibin."
**WAN / STENBOL / DÎHA**

## Operasyona li dijî DTP'ê protesto kirin

**COLEMÊRG**

Operasyona ku di 14'ê nîsanê de li hemberî DTP'ê hate destpêkirin û hê jî didome li Gevera Colemêrgê ji aliyê YDG-M'ê ve bi meşekî hate protestokirin. Bi sedan kesên ku li ber avahiya DTP'a Geverê hatin ba hev ber bi Meydana Ozgurlukê ve meşiyan. Şaredarê Bajêrgehê Hurşît Tekîn, Serokê DTP'a Geverê Arîf Karay, KESK, DÎSK û Însiyatîfa Dayikên Aştiyê jî piştgirî dan meşê. Di meşê de pankarta "Ciwan agir in, ev agir dê we jî bişewitîne" hate vekirin û dirûşmên "PKK gel e, gel li vir e" hatin berzkirin. Piştî meşê li ser navê komê Berdevkê YDG-M'a Geverê Rojhat Oskan daxuyanî xwend. Ozkan got ku ciwan li hemberî pêkutiyan bêdeng namînin û xwest pêkutiyên li dijî DTP'ê bi dawî bibin. Ozkan bang li hikûmeta AKP'ê jî kir û xwest ku operasyonan bi dawî bike. Piştî daxuyaniyê girse ber bi avahiya DTP'a Geverê ve meşiya û di meşê de sirûd hatin xwendin.

## 15 sefîrên YE'yê tên Rihayê

**RIHA**

Ligel Nûnertiya Komîsyona Yekîtiya Ewropayê ya Tirkiyeyê, 15 sefîrên welatên Ewropayê di navbera 27-28-29'ê gulanê de tên Rihayê û dê gelek hevdîtinan pêk bînin. Sefîrên welatên Ewropayê ji bo danasîna projeyên ku piştgiriyê didinê tên Rihayê. Nûnertiya Komîsyona Yekîtiya Ewropayê û sefîrên 15 welatan ji bo 3 rojan dê bên Rihayê. Heyeta YE'yê ligel rêveberiyên herêmî dê danûstandinan ligel saziyên sivîl jî pêk bîne. Di vê serdanê de dê danasîna projeyên ku YE piştîgiriyê didê bê kirin û sefîr dê tevli bernameyên çandî jî bibin. Sefîrên welatên Ewropayê dê tevli xwarineke ji aliyê Odeya Bazirganiyê ve tê dayîn bibin. Di vê hevdîtinê de karsaz dê pirsgirêkên xwe bînin ziman.

## Li Kurdistanê bû dijberî 'Rojava'

Li Îranê di 12'ê hezîranê de hilbijartin pêk tên. Serkêşê Oldariyê Ayetulah Elî Xamaney çend roj ji bo hilbijartinê mayî bangî hilbijêran kir ku dengên xwe nedin namzetên alîgirên 'Rojavayê'. Xamaneyê ku li Îranê wekî reformîst tê zanîn balkêş e di axaftina xwe ya li Kurdistenê kiriye de vê bangewaziyê dike.

Xamaney di çarçoveya xebatên hilbijartinê de li Eyaleta Kurdistanê xitabî gel kir. Balkêş e ku Xamaneyê li Îranê wekî siyasetmedarekî reformîst tê naskirin li Kurdistanê ji bo ku gelê kurd dengên xwe bidin pergala paşverû ya Îranê dijberiya 'Rojava' kir. Xamaney wiha got: "Hilbijartina namzetekî ku xwe li ber hêzên Rojava şirîn dike dê ji bo Îranê bibe felakete mezin. Dengên xwe bidin qaîdeyên şoreşê û riya Mela Xumeynî." Ev gotinên Xamaney wekî piştgiriya ji bo Serokomarê Îranê Mehmûd Ahmedînecad hatin fêmkirin. Ehmedînecad û 'Rojava' ev demeke ji ber bernameya nûkleerê ketine ber hev. Namzetê Reformparêz û Serokdewletê berê Mîr Huseyn Musevî û Serokê Parlamentoyê yê berê Mehdî Kerubî li aliyekî û dijberê Ehmedînecad û Fermandarê Parazvanêr Şoreşê Muhsîn Rizaî li aliyekî banga diyaloga bi Rojava re dikin. Xamaney hefteya borî bêyî ku navê wî lêvbike piştgirî dabû Ehmedînecad.

**Darvekirin didomin**

Li Îranê her çiqas heyecana hilbijartinê hebe jî darvekirin jî bê navber didomin. Di nava 18 rojên dawî de 44 kes, di nava 5 mehan de 185 kes li Îranê hatin darvekirin. Rojnameya Kayhan ragihand ku herî dawî pêr mehkûmekî binavê Ehmed E. hate darvekirin. Li gorî daneyên hatine bidestxistin meha 49 kes, meha sibatê 16 kes, meha adarê 33 kes, meha nînasê 15 kes û di navbera 1-18'ê gulanê de jî 44 kes hatine darvekirin. Li gorî Rapora Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî sala 2008'ê li Îranê 346 kes hatine darvekirin. Di warê darvekirinê de Îran piştî Çînê di rêza duyemîn de cih digire. **AMED**

www.arsivakurdi.org

# Tama Kurdî

**NEDÎM YILMAZ**

Di her tiştî de li gor hebûna wî tiştê tamekê wî heye û tama tiştan bi tiştan ve xweser e. Dema navê "tam-çêj" tê bilêvkirin, di hişê mirovan de "ziman" derbas dibe. Lewre ziman; lebatek ji pergala anatomiya mirov a tam dihilîne ye. Lê wek her tiştî tamekî ziman jî yê xweser heye. Tama ji ziman diafire, jê re 'ziman' tê gotin.

Li cîhana mirovahiyê de bi hezaran ziman hene. Tama her zimanê heman yek e; amurek karê têkildarî, dan û standina bi nawber mirovan de pêktîne ye. Xima civakan jî li ser bûyîna vê tamê ava dibe. Ango jî zimanek gelekê ji gelek neteweyekê û ji neteweyek welatekî diafire. Di vê rista zincirê de ziman karê dayikiyê dike ku ji lewre ji zimanê her gelî re, ji bo wî gelî dibjêjin 'zimanê dayikê." Lewre netew, welat, xak bi awayekî din wek bi navê "dayik" tê bilêvkirin. Ji xwe dema mirov ji dayik dibe û çavên xwe li cihana rengîn vedike ewilî bi zmanê dayika xwe tê digihêje tama her tiştî. Ji vê sedemê ye ku li ser ruyê cihanê tama tu tiştekî wek tama zimanê dayîkê xweş û şêrîn nîn e. Ji bo me kurdan jî tama zimanê kurdî heman bi vê ewayê wetedar e. Gelo çiqas tama zimanê dayikê ji zimanê me tê. Heke ku em xwe hewcedariya piskirina vê pirsê bibinin û bixwînin zimanê kurdî tam bikin, em dikarin navnîşanek bidest bigirin û rêwitiya wê navnîşanê bikin.. Navnîşan ev e: kûr û dûr biponije û bi bîr bîne wê derguşa ku dayikak te, te têde hejandî û mêjaniye. Ew dayika ku xewa şevê li xwe herimandiye û lewijokên ji evîna dilê xwe ji te re lewijandiye. Ew çîrok û meseleyên ku dapîr û bapirê te ji bot e mînmînine bi bîr bîne. Radyoya li Erîvanê bibîr bîne: Dengê bilora Egîtê Cimo, awaza Kawîs axa ya çemê çetelê…. Hewar e de xalo… Zîzbûna wek xwendina şehlûl û bilbilan staranên Meryemxanê, Xerapetê Xeço, Mîhemed Şêxo, Tahsîn Taha, Şakîro, Miradko, Ozan Mîzgîn, û Ozan Sevkan bi bîr bîne. Cardin here ziyaretgeha xanî.

Baba û evîna Mem û Zînê pişêve nava tasek ava serekaniya Bazîdê û bi noşîcan vexwe. Here û ji mîr Celadet re bibe mêvan û lê guhdar bibe de ka çima navê kowara kur ji kûr û tîrohiya hest û ramanên xwe dixemiland, danîbû "HAWAR!!!" Hîm bibe, ew hewera çi bû? Heta ku li helbesta Seydayê cigerxwîn ya bi navê 'kime ez'! candin guhdar neki, ji paşve mezivre.

Gelo piştî vê rêwtiyê, niha tama zimanê te çawan e? Li ser zimanê te tama zimanê dayikê heye an na?

Heke te bivê li ser zimanê xwe radeya tama zimanê dayikê bipivî, em dikarin şîhîn (mêzin) ek bidine te. Bi kerema xwe re vê şihînê bigire. Tiştên ku me lê destnîşan kir, tu wan bipîve.

Jiyana rojane de axaftin xwendin, nivîsandin, ponijîn, hizirandina bi kurdî çiqas bi kar tênî, bipive. Te dît! Roda wî li çavên te ye. Heke tu ji nizim-mayîna radeya tama zimanê dayikê ya li ser zimanê xwe razîninî, divê ku pir bixebitî. Te di karên xwe yên rojane de çiqas rada axaftinê, rada xwendin û nivîsandinê, rada ponijandin û hizirandinê bilind kir, dê tu bigihêjî asta xewndîtinên bi kurdî! Ew çax dê tu bigihêjî tama xweşikbûn û şêrînahiya zimanê dayikê.

Heke tu mereq bikî, bipirsî û bibêjî "gelo tama zimanê dayikê dişibe tama çi tiştî?" Bersîva me eve: Dişibe tama xwe; xwesere. Bê şirik û bê emsale. Tu çiqas ked lê bidî, dê tu ew qas bigihêjî şêrînahiya tama wê.

Heke tu pirsa radeya xweşikbûna û şirînahiya wê bikî, here wê pirsa xwe ji bindeqê Hîzanê, ji hingivê Şemîzdanê, ji guzên Elcevanê, ji sêvên Xelatê, ji fistikên Dîlokê, ji zebeşên Amedê, ji hinarê Zîvzikê, ji mişmişên Meletî, ji tiriyê Mêrdînê, ji helewa Sêrtê, ji hêjîrên Sînê, ji zêxa Efrînê, ji ava çavkaniyên Serhedê, ji mastê miyên koçerên li zozanan û li seranser, li her çar parçê Kurdistanê bipere û çiqas gul û çîçekên heyî, ji çiqas evîndarek heyî, ji bêhn û evîna dilê wan bipirse..

Ew ê ji te re bibêjin ku em heft avên li çemên Dîcle û Firatê jê hatine şuştin. Tu tama me hemuyan tê bikî dîzekê de û heft caran li ser agirê kuçên dara berî bikelînî û bipalikînî, ew çax dê tama me nêzîkahiya li xweşikbûn û şêrînahiya tama zimanê dayikê bike.


Ango tama zimanê dayikê hem şêrîntire ji tama hemû hayiyan û hem jî şêrînahiya hema heyiyan di nava tama xwe de diêwirîne…

Çawa dibêjin "Bihişt di bin pê dayikê de ye", tama tiştan jî di nava zimanê dayikê de cîgir û veşartî ye.

# Delala Min

*Nizanim ev nama min bigihîje te*
*yan di riyên hesretî de bimîne*
*wek kevirê ku di nav lehiyekî de*
*bixişike*
*an jî mîna pelê kovanê*
*bi bayê payîzê re di her alî de biteriqe*
*nizanim!*
*ew ê çawa bigihîje te nizanim*
*lê dîsa jî di dil de yî tu*
*dîsa jî nasekine ev dilê dijrêzik*
*tu dûrî ya*
*di nav kolana dilê min de digerî*
*bê qufle*
*ji bo vê tilî nasekine*
*dinivisîne van xeyalan*
*delalê!*
*dibêjin payîz dûrketin e ji hev û du*
*dûrketina kenê bi rengîn e*
*wê çaxê ez ê çawa bimînim*
*bê rengîn*
*ez ê çawa germ bibim*
*di bin baranên winda de*
*tu bêje delalê*
*ji ken dûrketin ne windayîn e?*
*ji reng dûrketin?*
*li kuçên nederketî*
*asoya esmanê xwe winda kirin*
*ne wisa!..*
*helbestvanekî digot*
*„em ji hev têr nebûn!..*
*"em jî ji hev têr nebûne*
*em ji dilê hevdu*
*ken û giriyên hevdu têr nebûne*
*kes çima me nabîne*
*rojên payîzê dirêj û pelîsokî ne*
*rojên bê te kesera emrê min e*
*bi vê payîzê kulîlkên çolî*
*tên bîra min*
*dişibînim te*
*dişibînim xeyalên me yên pêşerojê*
*kulîlkên çiyayî tên bîra min bê guman*
*mîna çavên te yên zelalî*
*û kewgirî…*
*tu bêje delala min!*
*çima payîz veqetandin e?*
*çima kulîlkên çîyayî tên bîra min vê demê?*
*çima kulîlk bi rengê êşa me ye?*
*û ji şewata me ye?*
*wê kengê payîz rabe ji ser emrê me?*
*Pirs!.. Pirs!.. Pirs!..*
*bersivê bide min, li benda te me!..*
*min bêriya dengê te kiriye!*
*bêriya zarokatiya me kiriye!*
*dengê min nayê te?*
*hatim dawiyê, tilî sekinî*
*lê deng hin li benda*
*dengdana xwe ye!*
*bi vê hêviyê têm çavên te yên stêrkî*
*silav û bi hezkirin*

***ROJBÎN PERÎŞAN***





evdilekoçer@yahoo.com
Evdile KOÇER

# Rihê Ziman... Zimanê Rih...

Ez jî nizanim bê çima?

Sedemên wê yên 'lojîk' jî qet nizanim, lê dema ku ez bi tirkîaxêvekî/ê re bi kurdî dipeyivim, hemû xeyalên Egîd û Bermalên min ên ku min di şevereşkên bê xwedayî de ji paşila mirinê derxistine û ji nû ve welidandine, çawa ku soz bidin hev û li ber bayekî nenas bikevin ji nişka ve xwe ji hişê min diterikînin...

Henekên min ên ku ez di nav dilopên behra girînê de jî wan dixim bûk û zava, wextê ku xuşexuş bi ser gotinan jî dikeve wextê ku melayê xwedêjêrazî bi gotinên fiqspî ve terqîna peyvan jî dixwîne, xwe nagihînin hawarê; rûyê xwe mîna melkemotên kulê tenî dikin û serê xwe dixin bin axa sor...

Bihar û payîzên min ên ku ji nav piziya nefelên çîrokên diya min weşiyane ber serê min û di ber siya min re ji nû ve şîn bûne, dema ku ava vegotina demsaleke din dadiqurtînin çeng dibin, wekî wan qehremanên xewnşkestî xwe bi ser min de sil dikin û di ber siya min re bi dileke têkçûyî li şibakeke oxirê digerin...

***

Ez jî nizanim bê çima?

Sedemên wê yên 'lojîk' jî qet nizanim, lê dema ku ez bi kurdîaxêvekî/ê re bi tirkî dipeyivim, hemû avahiyên rihê min ên ku bi bayê delalî û miziriya zarokatiya min hatiye xemilandin û hinekirin, çawa ku bixwazin xwediyê xwe biguherînin deriyê rûyê xwe bi ser hişê min de digirin...

Zimanê min ên ku peyvên tirkî nola zarokekî fêhîtokî ji malikên hişê min digire û berdide ser dilê hev, weke keçika ku bi darê zorê ketibe dilê kerxaneyê û bi awayekê dixwaze xwe jê derxîne, di devê min de xwe diperpitîne û dixwaze xwe jê bavêje...

Bişirîna min a ku di nav awir û keziyên hezkiriyên min de meyiyaye, dema ku gotin û hevok milê hev digirin û dikevin dîlanê jî mîna pîrheboka xwedêjêstandî rûyê xwe qîç dike, rihşemaliya xwe ji dilê min vedişêre û dixwaze li wî hespê boz ê ku di piştperdeya awirên min de mexel daye siwar bibe û bi çargavkî bibeze...

***

Ez jî nizanim bê çima?

Sedemên wê yên 'lojîk' jî qet nizanim, lê dema ku ez bi kurdîaxêvekî/ê re bi kurdî dipeyivim an jî bi tirkîaxêvekî/ê re bi tirkî qise dikim, hemû meşteleyên hişê min wekî çiveçiva mizgîniya biharê şîn dibin...

Ken û tîqetîqên min dibin bûk û zava û li wî hespê boz siwar dibin...

Bihar û payîz bi destê zivistanê digirin...

Awirên min avis dibin...

Û ez dîsa dibim koçer û li deşt û zozanên jiyanê dikevim...

***

Çima, ez jî nizanim...

## HAWARA EYŞO

REMO BÛYE XORTÊ 14 SALÎ





REMO KÊFA ZERO TÎNE





## JI PIŞT DÎWARÊN HEBSINÎ

BIMIRE ŞÎDETA LI DIJÎ JINÊ




AZADÎ JI BO GIRTIYÊN ZINDANAN




www.arsivakurdi.org

# Ghobadî Îranê terk dike

**Derhênerê kurd Bahman Ghobadî ji ber ku li Îranê rastî astengiyan tê, nikare fîlman bikişîne, fîlmên wî nayên nîşandan û rastî sansurê tê dê venagere Îranê. Ghobadî jî wekî derhêner Yilmaz Guney li Fransayê ye û heman pirsgirêkan dijî**

**I MURAT AKTAŞ** - PARÎS - ANF

Derhênerê kurd Bahman Ghobadî ji ber fîlmê xwe yê dawî yê bi navê “Kesî Az Gorbehayê Îranî Khabar Nadareh” (Kes Behsa Pisîkên Îranê Nake) ku mijara wî çend ciwanên ku dixwazin li muzîka rock, rap û metalê guhdarî bikin e tengasiyan dijî. Ghobadî jî wekî derhênerê kurd Yilmaz Guney ku piştî xelata Palmiyeya Zêrîn ya Cannesê wergirtibû nikaribû vegere welatê xwe, li vir sirgûniyê ye. Ghobadî jî niha heman pirsgirêkê dijî.

Ghobadî anî ziman ku ji aliyê rejîma Îran û hîn kesan ve wekî ‘kurdekî cudaxwaz’ tê binavkirin û sûcdarkirin û Ghobadî ev yek wekî ehmeqiyê bi nav kir. Ghobadî diyar kir ji ber ku divê ev fîlm li Tehranê bihata kişandin wî fîlm li Tehranê kişandiye û rejîma Îranê heta niha gelek fîlmên wî sansur kirine û bi guman e ku ev fîlm li Îranê bê nîşandan. Her wiha derhêner ji jiyana kesên ku di fîlmê de lîstine jî bi guman e.

**‘Êdî mala min valîzê min e’**

Derhêner ji ber ku di fîlmê xwe de rejîma Îranê rexne dike nikare vegere Îranê û eger vegere ji bo fîlmkişandinê destûr nayê dayîn û wiha got: “Ez gelek baş dizanim eger ez vegerim Îranê êdî destûr nadin ez fîlman bikişînim. Ji ber vê ez gelekî xemgîn im. Di jiyana xwe de heta niha di mijarên pîşe û kar de ewqas li ber xwe neketibûm. Êdî ez nizanim ku der welatê min e. Niha hemû mala min ji vî valîzê otelê pêk tê. Ez nikarim vegerim Îranê. Her tişt ewqas zehmet û tariye ku ez nizanim ez ê çi bikim. Di temênê 39’an de ez dixwazim biçim cihekî ku ez bi rihetî fîlmên xwe bikişînim.” Derhênerê kurd bi lêv kir ku nikare vegere Îranê û di mejiyê wî de çûna başûrê Kurdistanê, Amerîka û mayîna li Fransayê heye.

Ghobadî destnîşan kir ku jiyana kesên ku bi awayekî veşartî karê muzîkê dikin û pisîk û kûçikên Îranê dişibin hev. Ji ber ku li Îranê derxistina pisîk û kûçikan ya derve qedexe ye. Kesên ku xwedî dikin dernaxin derve û her wiha kesên ku muzîka rap an rockê dikin jî li cihên talde muzîka xwe pêk tînin. Ji ber ku di fîlmê derhêner yê beriya vê li Îranê rastî sansurê hat derhêner ji bo kişandina fîlmê destur negirt. Bi awayekî korsan fîlm kişandiye û di kişandina fîlmê de gelek zehmetî kişandine.

**Li Îranê maf tên binpêkirin**

Bahman Ghobadî destnîşan kir ku li Îranê kesên muxalîf rastî astengî û zehmetiyan tên û li vir mafê mirovan tên binpêkirin û wiha pê de çû: “Li Îranê îro ewqas pirsgirêk hene ku dema mirov dinêre rastî pisgirêkan tê. Bi taybetî jî di binpêkirina mafên mirovan de gelek tişt hene. Bi hezaran ciwan di girtîgehan de ne. Kesek nikare bi rihetî karê xwe yê hunerî bimeşîne. Gelek muzîkjen derhêner hene berhemên wan bi riyên korsan tên firotin. Mirov tenê ji bo stranekî jî rastî cezayên bi salan tên. DVD’iyên min li vir qedexe ne.” Ghobadî diyar kir ku li Îranê bi taybetî jin rastî zext û zordariyan tên û jin bi tu awayî nikarin xwe îfade bikin.



## ‘Jiyana kurdan hatiye parçekirin’

Derhênerê kurd Bahman Ghobadî anî ziman ku li cîhanê 40 milyon kurd hene, kurd bûne 4 parçe û jiyana wan hatiye parçekirin û wiha axivî: “Hin kurd di girtîgehan de ne hin girtî li sirgûnê ne û kurdên ku li wir mane rastî zext û zordariyan tên. Dema mirov li Tirkiye, Îran û welatên ereban dinêre heman dîmenî dibîne. Lê kurd li hemberî hemû zext û zordariyan li ber xwe didin. Ez li hemberî hemû zordariyan dîsa jî bi hêvî me. Di wê baweriyê de me ku kurd dê mafên xwe bi dest bixin.”

# Mîhrîcana Amedê bi atolyeyan dest pê kir

9’emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê bi atolyeyayên çand û hunerê dest pê kir. Atolye dê ji aliyê hunermend û akademîsyenên ku di beşên xwe de pispor in ve bên dayîn. Her wiha atolyeyên wekî; lîstikên gelêrî, peykersazî, wênesazî, şano û sînemayê pêk tên. Atolyeyên mîhrîcanê ji aliyê gel ve rastî eleqeyeke mezin tên.

Mîhrîcana Amedê wek kevneşopiyekê her sal tê lidarxistin. Îsal jî xebatên mîhrîcanê bi coşeke mezin dest pê kir. Xebatên mîhrîcanê niha bi atolyeyên def, şano û lîstikên gelêrî berdewam dikin. Atolyeyên peyker, wêne û sînemayê jî rojên bê de vedibin. Atolyeya defê ji aliyê mamosteyê Navenda Çand û Hunerê ya Dîcle Firatê Mamoste Şêrko ve, atolyeya wêne jî ji aliyê Ûmût Kaçar ve dê bên lidarxistin. Lîstikên gelerî jî ji aliyê Osman Bozkurt ve li parka Sumerê, ji lîstikên Mêrdîn û Amedê xebat pêk tên. Atolyeya şanoyê jî li Salona Şaredariya Mezin a Amedê de ji aliyê Mamoste Muhsîn Osman ve tê birêkirin.

Xebata atolyeya peykera jî ji aliyê Atolyeya Hunera Sumer, mamoste Firat Erdogan ve dê bê vekirin. Atolye 2 mehan dê dewam bike. Mijara wê jî, bi giranî dê aştî biratî be. Li vê atolyeyê, dê ji seramîkan diwarek bê çêkirin û mijara wî jî aştî be. Li pê avakirina vê seramîkê, dê li dûwarekî bajêr ve bê pêvekirin.

**Bi Ustaoglu re atolyeya sînemayê**

Ji atolyeya mîhrîcana îsal yek jî sînema ye. Li atolyeyê bi derhêner Yeşîm Ûstaoglû, dê fîlm bên nirxandinê. Atolye dê li Sînemeya Bêrîkê ya Bûrhan Karadenîz bê çêkirin. Fîlmên ‘Revîtiya Rojê’(Guneşe Yolculuk), ‘Demake Ewran Dipên’ (Bulutlari Beklerken), ‘Qutiya Pandorayê’ 23-24’ê gulanê bên nîşandan. Hate ragihandin ku hemû gel vexwendî atolyeyan e. **AMED**







# Li Amedê panela ziman

Kurdî Derê li Amedê bi boneya Cejna Zimanê Kurdî panelek li darxistin. Nivîskar Adil Zozanî bilêvkir ku kurdan perçebûna welatê xwe di jêrhişê xwe de qebul kiriye û divê ji bo netewebûnê divê kurd ziman, dîrok û çandeke hevpar û pêşerojeke wan hevpar hebe.

Panela ku ji aliyê Kurdî Derê hat organîzekirin de xwediya rojnameya Azadiya Welat Emîne Demîn moderatorî kir û nivîskarê rojnameya me Adil Zozanî, nivîskar Zaza Cebelî, nivîskar Adil Ercan û rêvebirê Kurdî Derê Mehmet Şahîn wekî axêvger beşdarî panelê bûn. Panel di avahiya Kurdî Derê pêk hat. Emîne Demîr Cejna Zimanê Kurdî pîroz kir li ser girîngiya ziman sekinî.

Adil Zozanî di axaftina xwe de li ser rojnamegeriya kurdî, ziman û netwebûnê sekinî û anî ziman ku di warê rojnamegeriyê de çar perçeyên Kurdistanê xwedî agahî nîn in û wiha got: “Kurdên her parçeyekî dîroka rojnamegeriya kurdî ji xwe dide destpêkirin. Gelek sedemên vê yekê hene. Lê sebebê esasî ew e ku me kurdan di jêrhişê xwe de parçebûna welatê xwe, ji hevcûdabûn qebul kiriye.” Zozanî bilêvkir ku rojnamegeriya kurdî rola xwe ya rewşenbiriyê ne lîstiye.

Zozanî di axaftina xwe de mînakên wekî Bedirxaniyan û radyoya Rewanê da û li ser dîroka çapemeniya kurd sekinî. Adil Zozanî anî ziman ku ji bo netewebûnê divê zimanekî hevpar, dîrok û paşerojeke hevpar, çandeke hevpar û divê baweriya pêkvejiyana pêşerojê hebe. Piştî Adil Zozanî Cebelî Akyol axivî û di axaftina xwe de li ser çand, ziman û hunerê sekînî. Akyol axaftina xwe zazakî kir.

Mamoste Mehmet Şahîn li ser şaritanî û zanistiya ziman axivî. Şahîn bilêvkir ku zanistî zimanê gerduniye. Şahîn da zanîn ku kurdan bi têkoşîna demokrasiyê ve nasname û zimanê xwe naskir. Nivîskar Adil Ercan di dawiya panelê de axivî. Ercan di axaftina xwe de cih da rola saziyan ya di zimanê kurdî de çi ye rawerikir. Ercan di axaftina xwe de saziyên kurd ji ber ku kurdî bi kar naynin rexnekir. **AMED**

# Biryara berhevkirina pirtûka ‘Nergîzê’ hate dayîn

Dadgehê biryara berhevkirina pirtûka ku jiyana çalakvana greva rojiya mirinê Nergîz Gulmez wek mijar digire dest û ji weşanxaneya Umut bi navê "Nergiz" hate çapkirin, da.

Li Tirkiyeyê zext û sansurên li ser çapemeniyê her tim di rojevê de ne. Herî dawî 13'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Stenbolê, bi îdiaya ku pirtûka jiyana çalakvana rojiya mirinê Nergîz Gulmez vedibêje ya bi navê "Nergîz" "Propagandaya rêxistina derzangonî dike" biryara berhevkirinê û qedexekirina firotina pirtûkê da. Pîştî operasyona di sala 2000'î de bi navê operasyona "Vegera jiyanê" pêk hat, Nergîz Gulmez dest bi çalakiya rojiya mirinê kir û di roja 123'yan de di 11'ê nîsana 2001'ê de jiyana xwe ji dest da.

**Banga hestiyariyê**

Weşanxaneya Umutê li ser biryara berhevkirina pirtûka Nergîz ku salên têkoşîna Nêrgîz û bûyerên li girtîgehan pêk hatîn vedibêje, daxuyaniyek da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de bang li riya giştî hate kirin ku li hemberî astengiyên azadiya ramanê bi hîstiyar bin. Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku divê zordariyên li pêşiya azadiya ramanê bên rakirin. **STENBOL**

# Li Wanê konsera Mikaîl Aslan

Humermendê kurd ê navdar Mikaîl Aslan, li Wanê konserek da.

Hunermendê kurd ê navdar Mîkaîl Aslan, li Salona Şamdamê ya Dahwetê konser da. Aslan di despêka konsera ku bi sedan kes tevlî bûn de bi helbestek kurdî dest pêkir. Aslan, di konsera ku 2 saetan domand de bi kurdî û zazakî sitirî û beşdar bi stranên xwe coşandin. Aslan, pîştî konserê axaftinek kin kir û derbirî ku di demên berê de li Tirkiyê xwendina stranên kurdî qedexe bûye lê niha li her qadê dikarin bi kurdî konseran bidin. Aslan, daxuyand ku gîhandina rojên wiha bi saya têkoşîna rûmet ya gelê kurd û ciwanên kurdan de hatine vê astê. **WAN**



# Li Denîzliyê Şahiya Alternatîf a Biharê dest pê kir

Şahiya Alternatîf a Baharê li Zanîngeha Pamukkaleyê bi konsera Mehmet Atli dest pêkir.

Endamê Meclisa Ciwanên Welatparêz û Demokratîk (YDG-M) ên li Zanîngeha Pamukkaleya Denîzliyê dixwînin dest bi Şahiya Alternatîf a Baharê kirin. Şahiya li Salona Tahwetê ya Tac pêk hat bi lîstika Yekîneya Çand û Hunerê ya YDG-M'ê amade kirî ya bi navê, "Jina Leşker û Cetwela T" dest pê kir. Piştî lîstika bi eleqeyek mezin hate temaşekirin Hunermendê kurd Mehmet Atli derket ser dikê. Xwendekarên kurd bi stranên Mehmet Atli coşiyan. Şahî bi panela Zimanê Kurdî dawî bû. **DENÎZLÎ**

# Rewşa jinan li 54 welatan wekî hev e

**Li gorî lêkolîna Dezgeha Jinên Kurd (IKWRO), kuştinên bi hinceta namûsê û zewacên bi zorê li 54 welatan didomin. IKWRO'yê der barê kuştinên bi hinceta namûsê û zewacên bi zorê de semînerek organîze kir**

Îranian Kurdish Women's Rights Organisation (IKWRO) a Dezgeha Jinên Kurd bi mijara zewaca bi zorê û kuştina bi hinceta namûsê semînerek li dar xist. Pisporên tevli semînerê bûn li ser kuştina bi hinceta namûsê sekinîn. Dîrektora IKWRO'ê Diana Nammi, bal kişand ser lêkolîna çêkirine û diyar kir ku li 54 welatan hê jî kuştina bi hinceta namûsê didome.

Rêvebera Rêxistina Mafên Jinan a Kurd a li Îranê Diana Nammi, Dîrektora li dijî sûc û şîdetê ya Teşkîlata Polîsan Ynonne Rhoden, ji yekîneya li dijî zewaca bi zorê ya Home Office Sarah Russell û aktîvîsta mafên jinan Ann- Marie Hutchinson tevli semînerê bûn. Axaftina vekirinê ji hêla Diana Nammi ve hate kirin. Nammi, bal kişand ser xebatên dezgehê û xebatên xwe bi slaytê nîşan dan.

**Helwesta polîsan yek e**

Nammi, da zanîn ku li Înglistanê jina bi navê Sufiye alîkariya tercumaniyê dikir. Nammi, diyar kir ku piştî demekê ji Sufiyê tu agahî negirtiye û wiha got: "Min der barê Sufiye de lêkolîn da destpêkirin. Ji bo serdana Sufiye min berê xwe da Silemaniyeyê. Lê ji ber ku Sufiyê ji yekî londonî hez kiriyê ji hêla bavê xwe ve hatiye kuştin. Li ser ve bûyerê min dest bi xebatên parastina mafên jinan kir."

Diana Nammi, di axaftina xwe ya semînerê de bal kişand ser kuştina bi hinceta namûsê û mînaka 6 jinên ku bi navê namûsê hatine kuştin da. Nammi, da zanîn ku kujer tu carî ceza nagirin an jî cezayên kêm digirin û wiha axaftina xwe dirêj kir: "Sala borî Banaz Mahmoda kurd ji hêla bav û mamê xwe ve bi hinceta namûsê hate kuştin. Her wiha di kuştinê de Teşkîlata Polîsan a Înglistanê jî berpirsiyar e. Polîs jî li gorî kevneşopiyan nêzîkî bûyeran dibe. Me li ser kuştina bi navê namûsê û zewaca bi zorê lêkolînek çêkir. Di encama lêkolînê de derket holê ku bi tevahî li 54 welatan zewaca bi zorê û kuştina bi hinceta namûsê didome."

**Zewaca bi zorê**

Dîrektora sûcên şîdetê ya Polîsan a Metropolîtanê Yvonne Rhoden jî axaftinek kir û di axaftina xwe de diyar kir ku mijara zewaca bi zorê mijara teşkîlatê ye û der barê mijarê de jî xebatan dikin. Rhoden, di axaftina xwe de bal kişand ser îstatîstîkên ku di destê wan de ne. Rhoden, daxuyand ku li gorî îstatîstîkan di nava civaka Asyayê de zewaca bi zorê pêk tê.

Dezgeha IKWRO di sala 2002'an de li dijî kuştin, şîdet, zewaca bi zorê, taciz û tecawizê têkoşînê dide, her wiha ji bo jinên kurd, tirk, fars û ereb şêwirmendiyê jî dike. **LONDON**

## Li kolanê bi hovitî hate kuştin

Li Wanê kesê bi navê K.Ç. hevsera xwe ya bi navê E.P. pêşî bi kêrê birîndar kir, piştre jî bi taksiyê di ser de derbas bû û ew kuşt.

Li gorî agahiyan, kesê bi navê K.Ç. li taxa Cevdet Paşa rûdinê ku 7 meh berê bi E.P. re mehra xwe birî û zewicî, bi hinceta hevsera wî ew bi birayê wî re xapandiye, hevsera xwe pêşî bi kêrê birîndar kir. K.Ç. ku piştre hevsera xwe avêt nîvê kolanê, vê carê jî bi taksiyê di ser de derbas bû û ew kuşt. Piştî ku welatiyan têkildarî bûyerê agahî dan polîsan, polîs hatin cihê bûyerê û cenazeyê E.P rakirin morga Nexweşxaneya Perwerdehî û Lêkolînê ya Wanê. K.Ç. ku di dema bûyerê de reviya, piştî demeke kurt hate binçavkirin. **WAN**



## Mamoste Xemrevîn

### Navên kûçikên me bûne karabaş û joe *(Pişaftin)*

Em peyva pişaftinê di wateya tunekirin, ji eslê xwe dûrxistin an jî ji holê rakirinê de bi kar tînin. Pişaftina kesekê/î yan jî ya civak û gelekî çawa pêk tê em wê jî her roj bi awayekî zindî di nav jiyana xwe ya rojane de dijîn.

Gelê kurd di welatê xwe de ji çand û zimanê xwe hêdî hêdî dûr dikeve. Roj bi roj bi axaftina peyvên zimanên serdest zimanê xwe ji bîr dikin. Civakên ku ji çend netewan pêk tên, danûstandinên wan di warê ziman de jî xwe didin der… Ziman dikarin ji hev peyvan bigirin. Ev rêbaz rêbazeke asayî û xwezayî ye. Lê gava ku asta girtina van peyvan zêdetir dibin, wê gavê zimanê zikmakî jî dikevin talûkeyê.

Yek jî bi awayeke sîstematîk pişaftina gelan a ji aliyê dewletan ve heye. Ev pişaftin bi qedexekirin, zilm û zordariyê gelan ji çand û zimanên wan dûr dixe. Bi vê rêbazê mirov an ditirsin zimanê xwe bi kar naynin, an jî tên asteke wisa ku ji eslê xwe û zimanê fedî dikin.

Kurd ji bo demeke dirêj di vê rewşê de man û jiyana xwe domandin. Lê bi têkoşîna azadiyê, mîna gelek tiştên din ên qedexe, tirsa axaftina bi zimanê xwe jî şikandin û di van çend salên dawî de dîsa vegeriyan li ser zimanê xwe. Xebat û xwestekên wan ên di warê zimên de jî her ku diçe zêdetir dibe. Lê ev vegerîna wan hê jî negihîştiye asteke baş. Hê jî gelek zarokên kurdan nizanin bi zimanê gelê xwe biaxivin. Dîsa jî heke hişmendiyeke xurt di nav civakê de belav bibe, di demeke kurt de rengê xwestekên axaftina bi zimanê dayikê jî dê bigihîje asta xwe ya rasteqîn.

Ez dixwazim ji nîqaşên li ser pişaftinê yekê bi we re parve bikim. Sê heftê berê li Rihayê di mitînga 1'ê Gulanê de ez û çend mamosteyên ciwan ên kurd, em li ser rewşa zimên axivîn. Mijara guftuguhê bi rastî dîsa pişaftin bû. Lê vê carê hevalekî ku mamosteyê zimanê tirkî ye, bi awayeke cuda û balkêş nêrînên xwe anî ziman û got: " Mamoste , ez di warê nivîsandinê de hinekî qels im. Ji ber ku ez nikarim baş binivîsim, daxwaziya min ew e ku tu van gotinên min binivîsî.

Ez dixwazim gelê me bila di vî warî de piçekî bifikire. Bandora çand an jî çandên serdest ew qas mezin e ku êdî ne tenê navên cih û warên kurdan, navên sewalên wan jî diguherin. Berê navên kuçikên me bi kurdî bûn . Gurêx, Xişto, Gurzo, Zalim, Cêwir, Dêlê, Zêrê û hwd…îro em bala xwe didin navên wan, yan bi tirkî, yan jî Îngilizî ne.

Navên kuçikên kurdan bûne Karabaş, Prenses, Joe, Lessî û hwd… Ev rewş min ditirsîne. Pişaftin daketiye vê astê û ev jî zimanê me yê ku heta niha li gundan hatiye parastin dixe talûkeyê. Ji ber ku kurdan heta niha li gundan çand û zimanê xwe parastibûn, bi valakirina gundan û hatina bajaran ev parastin jî hêdî hêdî ji holê rabûye. Yan jî kesên ku li gundan dijîn jî bi bandora amûrên teknolojîk ên wekî televîzyon û compîturê nikarin çanda xwe biparêzin."

Bi rastî jî wê rojê, me hemûyan nêrîna wî hevalî rast dît. Min jî di vî warî de hin lêkolîn kirin û ez jî gihîştim heman encamê. Bi vê mebestê mirov dikare careke din dubare bike ku lêkolîn û xebatên ku li ser çand û zimên tên kirin, divê bi giranî li gundan bên kirin û hişmendiya ku em dixwazin di nav civakê de belav bikin, ew jî divê li her derê û bi taybetî jî li gund û bajarokan bên kirin ku hê tiştên ku nehatine guhertin bên parastin…

## Li girtîgeha Bakirkoyê sewqa zîncirkirî

Girtiyên ku li Girtîgeha Girtî ya Jinan a Bakirkoyê dema tên sewqkirin bi girtiyên din re têne kelepçekirin. Girtiya bi navê Sema Gul li dijî vê pêkanînê derket û rastî mûdexaleya leşkeran hat. Gul der barê leşkeran de gilî kir. Her wiha Gul û 2 girtiyên din jî ji Komîsyona Mafên Mirovan a Meclîsê û Şaxa Komeleya Mafên Mirovan a Stenbolê re name şand. Dîsa bûyereke bi vî rengî li Îzmîrê pêk hat û wekî binpekirina rûmeta mirovan hate nirxandin.

Nêzî 2 hefteyan e li Girtîgeha Girtî ya Jinan a Bakirkoyê di dema sewqê de girtî bi hev re tên kelepçekirin. Li gorî qanûnên heyî divê destê girtiyan bên kelepçekirin, lê kelepçeya zincîr, tilî û zincîra sewqê ya ku girtî bi hevre tên kelepçekirin qedexe ye. Hiqûqnas diyar dikin ku kelepçekirina bi hev re tê wateya koletiyê û ji ber vê qedexe ye.

Sema Gul 11'ê gulanê dema hate sewqkirin, bi girtiyeke din re hate kelepçekirin. Gul li dijî vê derket û rastî mudaxelaya leşkeran hat, lê dîsa Gul bi girtiyeke din re hate kelepçekirin. Gul, leşkeran gilî kir. **STENBOL**



## Pere tune be mûayenê jî nîn e

Li Dezgeha Ewlehiya Civakê (SGK) ducaniyên ku ewlehiya wan a tenduristiyê tune be nikarin muayene bibin.

Endama Yekîtiya Tabîbên Tirk (TTB) û Koma Xebatê ya Ewlehiya Civakê Dr. Osman Ozturk, diyar kir ku ev pêkanîn dê rewşa xizanan xirabtir bike. Ozturk da zanîn ku kesên perê wan tune be û ewlehiya wan a tenduristiyê tune be dê wekî demên berê li malê zarokan bînin dinê.

Ozturk, destnîşan kir ku welidîn û muayeneya bê pere mafê mirovatiyê ye û helwesta SGK'ê li dijî wijdanê ye. Ozturk, got ku di sala 2008'an de ev tişt bê pere dihat kirin, lê li gorî teblîxata îsal ev xal jê hatiye derxistin û wiha axaftina xwe dom kir: "Pêkanîna SGK'ê dê rewşa jiyana dayik û zarokan bixe xetereyê. Her wiha di rewşên acîl de kes nikare di destpêkê de bipirse ka perê te heye an na. Her wiha li Tirkiyeyê hejmara nexweşxaneyên taybet zêde dibe. Ev tişt ji bo xizanan xetere ye." **ENQERE**

## Pêşangeha 12'ê Îlonê dirêj kirin

Mîhrîcana Filmên Jinan a Navneteweyî a Uçan Supurgeyê bi dawî bû lê ji ber daxwazê dema pêşangeha bi navê 12'ê Îlonê hate dirêjkirin. Pêşangeh di 12'emîn Mîhrîcana Fîlman de bi taybetî hate amadekirin. Pêşangeh heta 22'yê gulanê dê vekirî be. Bi vê pêşangehê dixwazin çîrokên ku 12'ê Îlonê pêk hatî berhev bikin û pêşkêşî gel bikin. Ji gelek bajaran jin tevli pêşangehê bûn. **ENQERE**



## Serkeftina bi salan

Midûra Giştî ya Dezgeha Yorsan û Cîgira Lijneya Rêveberiya Navenda Cam Gulfem Perçîna îzmîrî, bi hewldanên xwe dibin mînak. Xebat û têkoşîna bi salan ew serkeftî kir. Perçîn diyar kir ku 25 sal in di nav qada kar de cih digire. Di nav 144 endamên Odeya Sanayî ya Herêma Egeyê de tenê 4 jin hene û Perçîn jî di nav de ye. Perçîn, got ku di civakê de jin di rêza duyem de cih digirin û di nava şert û mercên zehmet de dijîn. Perçîn daxuyand ku wekî li her derî di rêveberiyê de jî serdestiya mêran li pêş e. Lê têkoşîna jinan jî girîng e . **ÎZMÎR**

www.arsivakurdi.org

Hawar
20 Gulan 2009 Çarşem

## Çima ceryan bi wan nagire

Weke ku tê zanîn çûk ji têlen ceryanê pir hez dikin. Gelo hûn qet fikirîne dema ku çûk diçin li ser têlên ceryanê çima ceryan bi wan nagire. Ji ber ku çûk tenê li ser têlekê vedinişin û temasî tu dereke din nakin, ceyran bi çûkên li ser têlan nagire. **AMED**



# Hem jehr e hem jehrkuj e

**Kuvark li hemû deverên cîhanê şîn dibin. Li Kurdistanê jî kuvarkên li deverên çiyayên bilind, di binê helizan de dibişkivin. Gelek cureyên kuvarkê hene. Hin cureyên kuvarkê jehrê dikujin lê hin cureyên wê jî bi jehr in**



Kuvark jehra axê û jahrkujê ruhberan e. Li gorî bilindahî, cih, war, mezinahî, biçûkahî tewr û rengên xwe tên guhertin. Kuvark li nav axê, di nav avên şîrîn, li kêm cihan jî di nav avên behran de jî hêşîn tên. Gelek rengên wan hene. Wek sor, zer qehweyî, spî, kremî û hwd. Hinek jî di tibê de tên bikaranîn. Hinek dibin sedemên nexweşiyan, hinek jehrîker û xisardar in. Ne tenê xisarê didin ruhberan, her wiha zirarê didin gihayan jî.

Hinek di sanaiya kîmyayê de tên bikaranîn. Hinek ji wan tên xwarin. Yên tên xwarin derman û xurekên herî baş in. Tê gotin 500 lewn û 14.000 cureyên wan hene. Lê yên herî bi qedir, yên bi kumik in û dişibin sîwaneyan. Rengê wan wek şîr spî ye.

### Li her derê cîhanê hene

Welatê kuvarkan hemû deverên cîhanê ye, hema li kîjan deverê ji nav axê dibişkivin ew dever welatê wan e. Dîroka kuvarkê digehîje 4 milyar salan. Di demên desthilatdariyên Sumer, Babîl, Asûr, Med, Ûrartû, Roma, Yewnana Kevnar, Firawûnên Misriyan û hwd. de hem wekî xurek û derman dihat xebitandin û her wiha ji bo hevîrtirş, şarav û kuştina mirovan jî hatiye bikaranîn.

Li Çînê 600 sal berî niha çandiniya wan dest pê kiriye. Di 1650'yî de li Fransayê pê re jî li welatên din yên Ewropa û li Amerîkayê çandiniya wê dest pê kiriye. Niha li hemû deverên cîhanê dest bi çandiniya wan kirine û bûye xurekek ku hemû deman peyda dibe. Li Kurdistanê kuvarkên herî xweş li deverên çiyayên bilind, di binê helizan de dibişkivin. Heba wan bi qasî firaxekê ye. Rengê wan spî ne, ji dûr ve dibiriqin û gelek tamxweş in. Ji wan kuvarkan re jî kuvarkên helizê tê gotin. Bixwe heliz jî dema nû derdikeve tê xwarin û dikeve nava penîr, ku mezin bû jî dibe êmê heywanan.



### Xwarineke dewlemend e

Di kuvarkan de proteîn, hesin, rûn, şekir, asîtên folîk, karbondhîdrat, gelek cureyên vîtamînan û hwd. heye.

Li gor lêkolînên Mîn Zangê ji Zaningeha Awistralya Bakur, li bajarê Hancouya Çînê li ser 2018 kesan lêkolîn hatiye kirin, ( ku nîvê wan bi pençeşêra memik ketibûn) aşkera bûye ku kuvarkan hema hema rîska penceşêrê ji holê hilaniye û yên pê ketî jî ber bi başbûnê ve çûne. Mîm Zang di rapora xwe ya di sala 2004-2005'an de dibêje: "Rojê xwarina 10 gram kuvark pêşiya penceşêrê digire. Bandora kuvarkên ter û hişk wek hev e. Lê heke çaya kesk jî bê vexwarin wê bandoreke çêtir nîşan bide". Her wiha Mîm dibêje ku li Çînê nexweşiya penceşêrê çar caran ji yên welatên pêşketî kêmtir e. Sedema wê jî xwarina kuvarkan û vexwarina çaya kesk e.

### Çawa tê bikaranîn?

Kuvark bi gelek awayan tê bikaranîn wekî tirşî, tirşik, sorkirin, biraştin, bi rûn û bê rûn xwarin jê çêkirin û hwd. Ji kuvarkan bi sedan cureyên xwarinan tên çêkirin.Ew jî karê xwarinpêj û kebaniyan e.

**AMED** *(Ji lêkolîna Bavê Jindar)*

## Pispor ji bo kuvarkê çi dibêjin?

Prof. Dr. Ahmet Marankî der barê kuvarkan de wiha dibêje: "Nirxa proteîna kuvarkê ji ya goşt zêdetir e. Kuvark hiş baş dixebitîne, westiyana bedenê diborîne. Ji bo kesên jar (lewaz) û kêmxwîn xurekeke pir hêja ye. Xwînê çêdike, bedenê bihêz dike. Kuvark jehra axê ye lê ji bo mirovan (ku ew jî ji axê çêbûne) jî jahrkuj e. Kuvark hewce ye roja bê patin bê xwarin û nemîne ji bo roja paştir. Hewce ye kuvark di beroş û firaxên alumînyum de neyên patin. Kesê nexweşiya bawî pê re heyî, hewce ye kêm bixwin. Kesên nexweşiya uremî heyî, divê kuvarkan nexwin. Pir cureyên kuvarkan yên bi jehr hene. Lê kuvarkên çandinî (yên bi destê mirovan tên çandin) mirov dikarin bêtirs bixwin".



# Gumankerî zêde dibe

Li cîhanê gumankerî her diçe zêde dibe. Ev yek zirareke mezin dide têkiliyên mirovan û mirov xwe ji jiyanê û civakê dûr dixin.

Gumankerî pir caran nahêle mirov bêhna xwe jî bigire. Jiyana civakî ya mirovan serobino dike. Kesên ku zêde bi xwe ne bawer in an jî kesên ku zêde ji xwe razî ne pir caran dibin kemîna gumankeriyê. Heke mirovên ku gumankerî pê re heye karsaz be an jî patron be jiyana xebatkarên xwe dike dojeh. Ev kes her tim bi fikra ku dê hin kesên zirarê bidin wan, dijîn. Gelo ev kesên ku gumanker in çawa li jiyanê dinêrin, çawa tevdigerin an jî cureyên gumankeriyê çi ne? Pispor der barê vê mijarê de çi dibêjin?

Di serî de pispor gumankeriyê wiha didin nasîn: Gumankerî di pişt perdeya bûyeran de gerandina hin tiştên cuda ye. Xwezaya mirovan de gumankerî heye. Heke guman tunebe rastiyên zenistî jî nikarin xwe nû bikin. Ev guman an jî gumankerî tiştekî normal e û pêwîst e jî. Li di bin her tiştî de hin tiştên din gerandin ne rast e û zirarê dide mirovan. Gumankeriya giran jî weke paranoya tê binavkirin.

### 4 cureyên gumankeriyê hene

Di psîkîatriyê de 4 cureyên gumankeriyê heye. Dema ku kesek bê xapandin dikeve gumanê. Kesên ku zêde xwe razîne, xwe cuda dibînin û dibêjin qey kesên derûdorê li hemberî wan dibe asteng. Di gumankeriya fîzîkî de jî mirov dibêje di laşê wî de hin parazît hene. Di gumankeriya eromatîk de jî mirov dibêje hin kesên navdar evîndarê mirov in.

Pispor diyar dikin ku kesên gumanker her tim di psîkolojiya nexweşiyê de ne. Heke dema ku dijî bijîşk ev xal li ber çavan neyê girtin dê ev rewş dê bibe sedama hin nexweşiyên cidî jî. Her wiha ev kesê nikarin bikevin nava jiyana civakî û her tim tenê dimînin. Dîsa rexneyên ku li wan tên kirin jî weke heqeretê dibînin û bertekan nişan didin.

Der barê tedawî de jî pispor dibêjin ku bi alîkariya bijîşk û pisporan gumankerî dikare di bin kontrolê de bê girtin. **AMED**

# Xwe di kanalan de hênik dikin

Li Edeneyê bi germbûna hewayê re zarokên malbatên xizan berê xwe didin kanalan. Zarok dibêjin ji ber ku perê wan tune ye nikarin biçin hewzên Şaredariya Bajarê Mezin. Ligel ku ketina van kanalan xere ye jî ji bo ku xwe hênik bikin dikevin ava van kanalan.

Beriya demekê Şaredarê Bajarê Mezin ê Edeneyê Aytaç Durak li bakurê Edeneyê hewz dabû çêkirin û gotibû ku dê li Edeneyê zarokên ku avjeniyê nizanin nemîn in. Lê zarokên Malbatên xizan ên ku li başûrê Edeneyê dijîn ji bo ku xwe hênik bikin dikevin kanalên avdayînê. Ketina hewzên ku ji aliyê Durak ve hatine çêkirin 1 TL ye. Lê zarokên malbatên xezan nikarin vî pereyî bibînin. Ji ber vê yekê jî zarok dikevin kanalên Karê Avê yê Dewletê (DSÎ). Zarokên ku dikevin van kanalan temenê wan di navbera 7-18 de ne. Zarok dibêjin ku ketina van kanalan xetere ye û paqij jî nîn in. Lê ligel vê yekê jî dikevin van kanalan. Zarok derdikevin li ser dîrekên 15-20 metre bilind in piştre xwe davêjin nava avê.

Zarokên ku dikevin van kanalan dibêjin ku ji ber ku tu alternatîfên wan nîn e ev mecbûr dimînin û dikevin van kanalan. Zarokan got ku şaredarî tu xizmetê jî nabe taxên wan. Zarokê bi navê Ramazan Dag diyar kir ku beriya 20 salan malbata wî ji Êlihê koç kiriye û hatiye Edeneyê. Dag got ku tu kes xizmetê nade taxa wan û wiha axivî: "Zarok dema ku li vir dikevin kanalê qixeniqin. Lê tu kes eleqedar nabe. Beriya çend rojan zarokek xeniqî. Ji ber ku pereyê me tuneye em nikarin biçin hewzê. Em jî dikevin ava vê derê. Dibêjin çawa be yên ku li vir dijîn kurd in. Ji ber vê yekê jî em bimirin jî ne xema wan e." **EDENE**



*Li Edeneyê zarok ji ber ku nikarin biçin hewzê, ji bo ku hênik bibin dikevin kanalan. Lê kanal nepaqij in û tenduristiya wan dixin xetereyê.*

# Turnuvaya futbolê bi dawî bû



Turnuvaya Futbolê ya Kovara Çand û Hunerê Amîgrayê ya bi navê 2'yemîn Turnuvaya Futbolê ya Amîgra ya Yahya Menekşe bi dawî bû.

Turnuvaya futbolê ya îsal diyarî Mahsum Dag û Mustafa Karaolan ku di meşa Amarayê de jiyana xwe ji dest dan hatibû kirin. Turnuva piştî musabaqaya finalê bi govendan dawî bû. **KOCAELÎ**

www.arsivakurd.org